


welat

Dilsoz ji ber
nameyekê
hate girtin



Rûpel 13

Sal:2 Hejmar:54 28 Sibat - 6 Adar 1993 5000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyî

Piştî Beytuşebab û Basesyê (Güçlükonak) ambargo belav dibe

Li Şirnexê ambargo

Rûpel 8



Bi Ûsivê
Batê re
hevpeyvîn

Rûpel 12



Armancên
grevê
pêk hatin

Rûpel 4



Dengbêjê
nemir
Miradko

Rûpel 11

Salvegera rojnameya Welat

Rojnameya Welat; ronahiya welat e, rewşa welat e, zaningeha welat e, dibistana welat e, mamosteya welat e, amojgeha welat e, berxwedana welat e, berdevkê welat e...

Her salê vi çaxî, salvegera te, bi dilekî şad bi eniyêke vekirî û bi seriyekî hildayî emê te piroz bikin. Di dema biçûkahiya xwe de em, li pirozkirina sersalê digeriyan. Me wiha digot:

Serê salê, binê, salê
Xwedê bihêle xortê malê
Niha ji emê wiha bibêjin:
Îsal Sibat û her sal Sibat
Xwedê bihêle rojnameya Welat
Erê, rojnameya Welat, Yezdan te ji me re bihêle û temenê te he-

zar salî bike. Di salekê de ez bi pêşengiya rojnameya Welat hîni Kurdî bûm. Û bi hezaran kesên min min, hîni Kurdî kirin. Bi saya Welat em dikarin bixwinin û binivîsin. **Apê Musa** digot: **"Xortên Kurdan pêwîst e ku, di du katjîmeran (saetan) de hîni xwedîna Kurdî bibin."**

Erê Apê Musa, va ye em hîni xwendîna Kurdî bûne. Ez bi Kurdî dihizirîm û ez bi Kurdî dinivîsim. Mamoste û dibistana min, rojnameya Welat e. Ez bi Welat tem perwerdekirin.

Hûnê bibêjin heta niha hûn bi çi zîmanî dipeyivî, ma tu ne bi Kurdî dipeyivî? Na! Ez ne bi Kurdî dipeyivîm. Ez bi Kurmancîyeke

çêrî dipeyivîm. Ew devok ji sedî deh-panzdeh bêjeyên (peyvên) wê bi Kurdî û yên din biyani bûn. Kurmancîya me weke rezek bêxwedî û di nava vi rezî de, ji bilî mewan strî, dirî, dar û devî, giyayê biyanî tê de hêşin hatibûn. Mewên wi, ne kesixandî bûn. Ew rez bêwec e, bêber e, ber nade (berdara wê nin e).

Rojnameya Welat jî, ji wi rezî re xwedî derket, bi gayên hêzdar (bi qewet), bi nir û halet, çargîşin cot kir. Bi mer û tevir, ber mewan tevir da (kola). Giyayên biyanî heşêf kirin, bi zanyaran kesixandî. Kirin rezekî hêşin û berz û dan destê me. Ji îro pê ve, em dê li zîmanê xwe xwedî derkevin û bi

pêş ve bibin.

Ji destpêkê ta niha, va ye deh nivîsên min bi Kurmancîya nûjen di rojnameya Welat de, tene weşandin.

Ne ji bo ku ez nivîskar im, tene weşandin. Ez ne nivîskar im. Nivîskarî pişeyeke (meslekî) zaf zore, ne karê herkesî ye. Ez vê hunerê di xwe de nabînim. Sedema weşandina nivîsên min, berpirsiyar û rêvebirên Welat in. Min teşwîkî xwendin û nivîsandina Kurdî dikin. Ji ber vê yekê ez dibêjim, Welat dibistan û mamosteya min e. Ez suxte û xwendevanê wê me. Disa û hezar çaran, rojnameya Welat li me û gelê me piroz be.

I. Omerî

FERHENGOK

- Alozi: Xetere, dijwart, tevlîhevi
- Amojgeh: Enstîtu
- Berz: Bilind
- Bêwec: Bêker, bêfeyde
- Berizandin: (Sataşmak, azarlamak)
- Bîrhat: Biranîn, xatirat
- Berdevk: (Sözcü)
- Cif: Ked, emek
- Dam: Damezrawe, mîesese
- Endozyar: Mühendis
- Gels: Pîrsgirêk, gelemşe, problem
- Hevkar: (İşbirliği)
- Hêl: Ali, teref, herêm
- Hevriki: Dijberî, îstîlaf
- Heşêf: Berhevkirina giyayên biyani
- Jaji: Celebek penir
- Kesixandin: Birrina mewan, çipilandin (Budamak)
- Kinc: Cil, libas
- Kori: Akademi
- Kul: Derd
- Kund: Bûm (Baykuş)
- Maliştin: Gezikkirin, paqijkirin
- Nasname: (Kimlik)
- Naverok: Muhteva (İçerik)
- Nizûl: Nivîsta çargoşe
- Nola: Nala, mina, weke
- Pawan: Daristana xisûsî
- Penaber: Multeci
- Penaberî: İlticati, multeciti
- Raye: (Yetki)
- Rayedar: (Yetkili)
- Rewşenbir: Ronakbir (Aydın)
- Tametitik: (Çerez)
- Taqet: Mecal, hêz
- Tekuz: Bêkusur, tam, mukemmel
- Temen: Emir (Yaş, ömür)
- Têbin: Dîtin
- Tori: Wêjeyî, edebî
- Tûncik: Poçak, tembörük
- Xong: Hilweşandin, herifandin, pelişin

Dîroka xwe ji şoreşa xwe hîn bibe

Gelek silavên şoreşgerî li wê dikim. Em, du heb keçên Kurd (xaltî û xwarzî), me heya niha diroka xwe nizanibû, em feqir û nezana bûn. Lê bi germbûna şoreşa Kurdistanê ya ku karkerên me pêş ve anîne û bi amadekariya rojnameya "Welat, Rewşen û Yeni Ülke" em hîni diroka xwe bûn, me diroka Kurd û Kurdistanê baş nas kir. Bi taybetî bi amadekariya rojnameya "Welat" em hîni zîmanê xwe yê rast bûn. Em dibêjin hemû gelên Kurd nemaze keç û jinên Kurd bila ew ji çavên xwe vekin, bi vir, gevezetî û listên mêtîngeran û kevneperestan nexapin. Bila bibêjin bes e, êdî em koletî naxwazin, em serfiraz û serbixwe bûne û jiyana bi rûmet a insani me divê.

Ji bo çi gelê me zamana wi ya dirokê hemû qedexeyê û çar û çûr e. Ji ber ku zordari, mêtîngerî,

dazanîna diroka Kurd û Kurdistanê, ji rast hînbûna dirokê re bîngêh e. Mêtînger, li ser piştî hespan û keran bi şûr û rimê xwe welatê me bi zordari û wehşîti zefî kirine, gelê me kirine binê nîrê zordari û koletiyê. Di cihanê de bilî zorê û wehşîtiyê tu tiştê koletî û bîndestiyê jî, ji gelan re nade qebûlkirin.

Îro, politikvan bi gevezetiyan xwe çiqas, "Bi biratiya gelan (gelê Tirk û Kurd) bi Tirkaniya Kurdan û dibêjin Kurd çiqek ji Tirkan in, navê wan, "Li ser berfê bi rê ve çûne, lingê wan kirîye 'qart-qürt' û ji ber wi bûye Kurd" çiqas van ifîra dikin bila bikin, ev ifîra hemû li dirokê tîn kirin. Îro dîndar (qaşo dîndar) dibêjin "mumin birê hev in." Sosyalist (qaşo sosyalist) dibêjin enternasyonalizmê de em birê hev û wek hev in. Lê em êdî pê hisiyên dawîya van vir û ge-

vezetiyan hemû hat. Incax gelên bîndest birê hev in.

Di bîngêhê wana de, di binê zor, zilmê û gevezetiyan de koletiya gelê me heye. Ji ber vê bani gelên Kurd bi taybetî keç û jinên Kurdan dikim! Bes e fêda koletiya di binê nîrê zordar û mêtîngerî ya dewlêra Tirk, Erebb û Eceem de, ji me re nin e. Ev hemû sosyalist û dîndarên vîrek û sextekar ji telalîya heqîtiya mêtîngerî û zor û zilmê dikin.

Ka binêrin! Mêtîngeran bi xencî, şewat, birçibûn, hêsrên çavan, kuştin, windakirina binçavan, namûs paymalkirin, sirgûn û perîşan û koletiyê çî dane me. Na weleh eger bi xencî vana tiştêk nedaye me. Lê, wekî wilo ye divê çareya me ew e ku em ji vî derdî xelas bin û wekî gelên cihanê serfiraz û azad bin û di nava wan de, cihê xwe yê bi rûmet bigirin. Ev jî bi

naskirina diroka xwe dibê û diroka xwe bi xwe binivîsin. Di pê re ji qerara serkeftin û serfiraziya xwe bidinê. Ji gelên bîndest re "afata" herî mezin ew e ku diroka wan bi destê mêtîngeran were nivîsandin.

Hey! Keçikno wa şoreşvanên me yên "karker" diroka Kurd û Kurdistanê bi xwîna xwe ya sor nivîsandine, divê em hemû Kurd êdî bi vir û gevezetiyan tu kesî nexapin û bibin alikarê şoreş û şoreşvanên xwe yên karkeran. Çimkî "heq nayê dayîn, tê standin." Koletî ranabe, tê rakirin, tê azadkirin bi van sloganan.

Bi hev re bibêjin
An zanîna dirokrast an mirin
An serkeftin an mirin
An welat, an mirin
Bimire koletî, bîji xelasiya hemû gelên bîndest û karker.

Keçikên Tatôsî:
Hewşan û Rindê/İzmir

Ji Hirvatîstanê silav

Berî her gotinê em dixwazin wê û hemû gelê Kurd ji dilekî germ piroz bikin û bibêjin:

Yek saliya rojnameya Welat li xelkê Kurdistanê tev de piroz be.

Hevalên heja; gava em li van welatên biyanî Welat hefteyê carekê digirin û rojnamegeriya Kurdî û ya biyanî didin ber hev, wê çaxê dide xuyakirin ku, milletê me cendî, belengaz û reben e û li paş milletê cihanê maye. Lê hevalên delal, hûn xweş zanibin gava ku em Welat bi dest dixin, her rûpelekê wê ji me re jî deh rojnameyên biyanî şîrintir û xweştir e.

Ji ber ku, zîmanê Welat zîmanê dê û bavê me, xwişk û birayê me, zîmanê xelkê me ye. Kul û derdê me dibêje, diroka me ya dîr û nêzik tîne ber çavê me. Û riya rast û durust, riya serxwebûnê, riya şoreşê, riya berxwedanê, "berxwedan ji jiyana e" şani me dîke. Yanî Welat navgînek e ji bo jiyana me ya bi gel re.

Lewre giring e her Kurdekî ku, dilopek xwîna Kurdîtiyê pê re hebe û li ku derê dibê bila bibê, Welat bîstine û bixwîne û ji Welat re binivîse.

Welat zîman e... Welat dirok e... Welat şoreş e...

Welat berxwedan e... Welat jiyana e... Û her bîji Welat.

"YXWK"

Yekitiya Xwendevanên Welatparêzên Kurdistanê Şaxê Hirvatîstan

Bêdengî şîrîkatiya sûc e

Imperyalist gava ku gelekî digirin bin darê xwe, beriya welatê wî şexsiyet û mejiyê wî digirin bin darê xwe.

Hêzên imperyalist û hevalbendên wî yên Rojhilata Navîn demêk dirêj gelê Kurd di bin darê xwe de, zêdetir bi welatê wî, bi meji û şexsiyeta wî mijûl bûn, li ser sekinin.

Serê wî perçiqandin. Zengeke stûr girtin ser mejiyê wî. Çiqas zengîniyêke welatê wî hebe, talan û qedexeyê kirin. Ne bi tenê bi gelê Kurd, di Rojhilata Navîn de çend dewlemendên ser zengari jî, ji xwe re kirine hevalbend û li ser şexsiyeta van gelan sekinine û ew bemeji kirine.

Gelê Kurd tu car bi vî awayî razî nebûye. Timî serhildan û şoreşê çekirîye. Hêzên imperyalist tevî hevalbendên xwe ve bi ser gelê Kurd ve hatine. Bi hovîti, xwestine gelê Kurd ji binî ve qir bikin. Lê belê gelê Kurd roj bi roj gurr bûye, zêde bûye. Bi vî gurrbûnê ve, yekser jî bûye. Hêzên serdest jî dema Osmaniyan ve heta niha, kîjan aliyê gelê Kurd e qels ditîbin pê girtine û lê mijî-

yane, ew qir kirine.

Gelê Kurd jî berê ve olperest bûye, ji ber vê yekê timî bi olê hatine xapandin. Dijmîn demêkê dengê gelê Kurd birîye. Weke serhildanên Şêx Seid, Agirî, Dêrsim, Reşkotan û Xerzan. Lê belê piştî 1960'î disa gelê Kurd doza hebûna xwe û welatê xwe kirîye.

Neyarê gelê Kurd jî tîrsa windakirinê disa bi her awayî bi ser gelê Kurd de hatiye. Ev hovîti di serê sala 1978'an de bilind bûye. Wek li Stenbolê kuştina 7 xwendevanên şoreşger û bilî vî bûyerê jî, kuştina ronakbîran -ev di bin siya TC'ê de, bi destê kontrayan dibûn- jî bo çavtirsandinê bûn. Lê çavê gelek şoreşger û welatparêz netirsîya.

Neyar disa rabûn, bi awayê bay û kalê xwe dest avêtin olê. Bi vî rengî bi ser welatparêzên Kurd ve hatin. Wekî bûyera Mersî. Ku ewlewîyê Kurd qetil kirin. Ketin nav nezan û paşvemayîyan, ew kesên pêşxwe nedîtî. Neyar ew ajotin pêş welatparêzan. Di serê sala 1978'an de, dewlemendên fesad di nav malan de û meleyên olfiroş jî, di mizgeftan de wiha digotin.

"Elewî ne musulman in. Elewî neyarê musulmanetiye ne. Elewî hatin, komunîst hatin, musulmanî jî dest diçe. Geli musulmanan rabin ehadê bikin. Biçûk û mezînen elewiya bikujin. Musulmanetî jî we re wiha dibêje û hwd."

Di meha Mijdarê de êriş dan ser welatparêzên Kurdistanê. Cihên karê wan, malên wan (xaniyên wan) şewitandin, pelastin. Di meha Kanûnê de êrişên xwe zêde kirin. Di 23'ê Kanûnê de polis bi eslê xwe ji Amedê, mudurê polisan A. Kadir Aksu, gotin bila kes ji mala xwe dernekevin. Welatparêzên Kurd derneketin derve. Gotina wan a ku dernekevin derve çênebû. Lê yên ku jî gundan bi xapandin hatibûn Mersî di rêberiya Ökkeş Şendiller de ku niha di Meclîsa Tirk de mebûs e dest bi qirkirina gelê Kurd kirin. Nêzî hezar mirovê Kurd tevî jin, zarok û mîr hatin kuştin. Hinek jî wan girtin, xistin firinan û qelandin. Piştî vî wehşetê hikûmeta Ecevit di 16 bajaran de rêveberiya awartê (idareya orfî) îlan kir. Ên ku li hember vî weh-

şetiye bêdeng man, ew girtin birin Qisleya Selimiyê ya Stenbolê.

Di sala 1990'an de Wali Hayrî Kozakçioğlu xwest ku disa li hemberî PKK'ê tiştêk wiha çêbike. Mele û miftîyan li hev civand. Û ji wan re digot: "Hûn karbidestên Komara Tirk (TC) in. Ne hewce ye ku hûn ji Komara Tirk re bixebitin. Herin di mizgeftan de bibêjin ku PKK Ermenî ye. Neyarê ola we ye. Kî yek ji wan bikuje diçe cinetê." Lê belê îro ev yek çênebû. Rabûn gund û bajarên Kurdistanê dişewitandin. Li aliyê din wek li bajarê Edenê Mersîne, İzmirê di nav gelê Kurd û Tirk de fesadiyê dikin. Gelê Tirk li hember gelê Kurd dikin neyar û berê wan didin hev. Lazim e ku gelê Tirk şiyar bibê.

Berbayî wan nekeve. Bila carekê din qirkirineke wek Mersî çênebe. Ev hikûmet û fesadên hanê ne bi tenê neyarê gelê Kurd in, neyarê gelê Tirk in jî.

Em xwendevan bi gelê xwe re ne, bi serokatiya gelê xwe re ne. Em li hember fesad û olfiroşan bêdeng namin. Dê bersiva Mersî û yên din bi tîkoşîna çekdari û rizgari, bê dayîn.

Xwendevanên Dibistana Navîn Amed

Suryanî koç dikin serrafî jî bi wan re



Suryanî koç dikin. Serraf jî bi wan re. Aziz Dilmeç li Midyadê serrafiyê dike.

Suryaniyên Tûr Abdîn, ji bilî dîn û neteweya xwe bi serrafîya xwe jî nav û deng dane. Lê belê, di van rojên dawî de, Suryaniyên vê deverê, ji ber terora cerdevanan (korucu) bar dikin û bi barkirina wan re, serrafîya wan jî winda dibe.

Burhan Erdem

Ji Midyadê heta Mêrdîn û derdora wan, bi navê Tûr Abdîn tê zanin. Tûr Abdîn bi dîn û bi neteweyên ku tê de dijîn deverê kozmopolît e. Di nav van dîn û neteweyan de ji xeynî Kurdên sunnî, Kurdên yezidî, Erebên lokal, musulmanên Mehêlmî. (Ev Suryaniyên ku di demê kevin de musulmanî qebûl kirine ne.) û Suryaniyên ortodoks hene. Di Kurdistanê de mintiqeya Tûr Abdîn, bi vî rengîniya dîn û neteweyên xwe ferqa xwe derdixê holê. Lewre li tu deverê din mirov nikare vî rengîniyê peyda bike. Bi vî piraniya dîn û neteweyên xwe, li gori ku tê qalkirin, li Tûr Abdîn berê pîrr dengî hebû, di nav xwe de kesi neheqî li hev nedî-

kir. Lê belê iro ji ber terora cerdevanan, ew pîrrdengîya berê nemaye, mirov li vir, divê an bibe cerdevan an jî, ji vî deverê bar bike.

Di nav rengîniya vî deverê de, mirovên Suryanî, ji bilî ferqa dîn û neteweya xwe, bi senetkariya xwe jî nav û deng dane. Vê navdana senetkariya wan jî, bi pîrrani, jî serrafîya wan tê.

"Berê gava ku qala serrafiyê dibû, ji navê Suryaniyan pê ve nav derbas nedibû". Bi vî awayî dest bi peyvê dike serraf Aziz Dilmeç. Di neh saliya xwe de dest bi vî kari kirîye. "Pîrr vî senetî hemû Suryanî ne, serrafî ne ew e ku, tu herî zêr bikirî û tu bîni bifiroşî, ku tu jî xwe re bibêjî, "ez serrafîm" divê tu zanîbi zêr çêki yanî şêkil bidî zêr an jî ziv. Lê belê serrafên iro di-

çin ji Stenbolê zêrên hazîr dikirin û difiroşin. Ji bo ku tu hîni vî senetî bibî divê tu jî sêlektiya xwe dest pê bikî û bi salan li ber destê hosteyan bixebitî. Lewre mirov nikare li gora daxwaza dilê xwe mirkut li zêr û zivan bixe."

Em ji wî dipirsin ka iro rewşa serrafiyê di çî halî de ye. Aziz Dilmeç bersîva xwe bi pîrsekê li me vedigerîne: "Ma iro Suryanî mane ku, serrafî bimîne?" Û axaftina xwe didomîne: "Em Suryaniyên vî deverê jî ber terora cerdevanan û jî ber ku em nikarin xwe xwedî bikin em koç dikin. Pîrr kes diçin Ewropa û hin kes jî diçin bajarê mezin ên Tirkîyê. Û bi vî barkirina Suryaniyan re, serrafî jî diçe û li vî deverê wînda dibe. Ji xeynî me çend Suryaniyên, serrafên vî deverê hemû zêrfiroş in. Em jî, li hemberî barkirinê ne. Lewre em li vî deverê dimînin."

Em ji wî xatîr dixwazin û radibin, ew jî disa dest bi karê xwe dike û mirkutê xwe bi derbeyên ritmik li tebaqa zivê xwe dixê.

Esnafên Kurd li Mêrsînê kepeng girtin

Navenda Nûçeyan- Kurdên li Mêrsînê, ji bo desetkîrîna greva Mebûsên Meclîsa Neteweyî, şahiyek li dar xistibûn û nêzî 4 hezar Kurd beşdarî vî şahiyê bûbûn. Di domana şahiyê de, hêzên dewletê bi hêzeke mezin ve êrişê vî şahiyê kiribûn û 20 kesî birindar kiribûn. Dû re tevî van birindaran, 150 kesî girtibûn bin çav. Li ser van bûyeran, esnafên Kurd, jî bo 2 rojan dikanên xwe girtin û dewletê protesto kirin

Kurdên li herêma, vî bûyerê mîna qetliamêkê dibînin û dibêjin, "Ev parçeyek jî tevgera hundirîn e." Li gor agahiyên ku digihên destê me, li ser girtîyan îşkenceyêke dijwar tê meşandin û di nav wan de, birindarên giran hene. Lê polis wan nabin nexweşxaneyê.

Esnafên Kurd li taxên Yenî Pazar, Gündoğdu, Kurdalî, Selçuklar û Demirtaşê, bi beşdariyêke xurt li hember kirinê dewletê sekinin û kepengên

xwe girtin. Partiya Keda Gel, Komeleya Mafên Mirovan û nûnerên kovarên sosyalîst jî, bi beyanên xwe vî êrişê mîna "terora dewletê" nîrxandin û kirinê dewletê yê li hember gelê Kurd protesto kirin.

Li ser van bûyeran mebûsên Partiya Keda Gel Zubeyir Aydar û Mehmet Sincar jî çûn Mêrsînê û li taxa bûyerê lêkolîn kirin. Ev herdu mebûs, piştî lêkolînê xwe de walî û midûrê emniyetê ziyaret bikin.

HAWAR

Dilbixwîn

Li Brukselê rûpeleke nû ji dîroka azadiyê

Rûpelên dîroka azadiyê roj bi roj bi keda girsên gelê Kurd û hîma hîmdarên serxwebûnê tene nivîsandin.

Ne tenê li tax û kolanên bajarên weke Amed, Cizîrê, Şîrnex.... Ne tenê li gundên serhildanê. Ne tenê li çiyayên ku di şkeftên wan de şoreşger planên jiyaneke nû datînin... Li hemû cih û derên gerdûnê jî bo hemû mirovahiya afirandî bi pênuşeke nû dîroka serkeftin û serfiraziyê li ser rûpeleke nû tene nivîsandin.

Berxwedana zindanan dengê xwe dide serhildana gund û bajarên, serhildana tolhildanê jî dengê sloganên xwe digihîne gerilayên îro, hêviyên pêşerojê. Bi vî gîyanê em jîyan dibin, eger mirineke hebe jî, emê bi vî gîyanê bimirin.

Em baş dizanin wê gundên me wêran bibin, wê gul û nêrgîzên gulistanên welatê me hêstirên xwînê bîbarînin, wê dayikên me lorîkan bixwînin, wê bilbilên li ser şaxan jî, li şûna kundan stranên şoreşgerî bistrên.... Belê, wê tanqên dijminî zarok û pêçekan biperçiqînin, lê hema azadî beramberî her tiştî ye.

Eger mirineke me hebe wê jî azadiyê be, eger jiyaneke me hebe jî, wê dîsa jî bo azadiyê be. Azadî jî bê xebat, bê xwêdan, bê xwînrijandin nabe. Bê guman em bi kevokên spî, ber bi azadiyê ve diçin, lê li hemberî me dagirker bi tanqan, bi topan, bi bombeyên kîmyewî ber bi qirkirina me ve tene.

Eger mirineke me hebe wê jî azadiyê be, eger jiyaneke me hebe jî, wê dîsa jî bo azadiyê be. Azadî jî bê xebat, bê xwêdan, bê xwînrijandin nabe. Bê guman em bi kevokên spî, ber bi azadiyê ve diçin, lê li hemberî me dagirker bi tanqan, bi topan, bi bombeyên kîmyewî ber bi qirkirina me ve tene, ji bo ku em wê azadiya xwe biparêzin, em neçar in ku bi hemû rengî li ber xwe bidin.

Bêhtirî 700 welatparêzên Kurd, tevî 15 endamên Meclîsa Netewî ya Kurdistanê bi armançeke pîroz derbasî greva birçibûnê bûn. Li hemû welatên Ewropayê, Awusturalya, Kanada... piştigirîya wan kirin û ketine livbaziyê, êdî Kurd bi Kurdistan re dibine yek, piştî xwe didine hev û bi hev re jî bo yek armançê di mirin û mayîne de ne.

Dinyaya bê guh û bê çav bi me hesiya, em ditin, hejmeke man: "Kurdên ku heya niha xwîna hev vedixwarin û ji bo mirîşekê bi dehan hev dikuştin, çawa milên xwe dane hev û bi yek gavê dimeşin...?" Dinya li me ecêbmayî ma. Ev çî hêz bû, çî kes bû, çî mejî bû, çî kesbûn bû ku, evqas belavbûn ci-vande ser hev û li hemberî dijmin rêza wan kire yek, belê awira giştî ya cihanî ev pîrs jî xwe dikirin.

Wê çawa rola Serok Apo jî bîr bibe, wê çawa ev gavên tene avêtin, şopan li pey xwe nehêlin, wê çawa mirovahiya sertewandî serê xwe bi vî serbilindiyê bilind neke?! Ne tenê em, Ewropî jî bi vî yekîtiya me serfiraz in. Parlementerêkî Ewropî dema ku bi serdanêkê diçe Brukselê di deftera bîranînan de wiha dinivîsîne: ".....Ez gelekî kêfxweş û şanaz im ku, îro dostê gelê Kurd im. Bi vî dostaniyê serê min pîrr bilind e, eger ev gel xwediyê xwe be, ezê her dostê vî gelê azadixwaz bimînim...."

Emê êdî jî bo çî xwe bixapînin û bi pîrsên biçûk û erzan re mijûl bikin? Emê çima li xwe û li ked û berxwedana xwe xwedî dernekevin? Emê êdî jî bo çî serê xwe jî çîroka "yekî-tî tune" re bihezînin? Ji vî yekîtiyê mezintir! Ji vî hêzê xurtir! Ji vî sloganê bêhtir tu sloganên din hene ku bejna azadiyê bixemilînin?! Ji vî meşê tu meşên din hene ku jî serxwebûnê re bibin hêvî?! Ji vî serokatîyê bêhtir tu serokatîyên din ên hemdemî hene ku jî bo jiyana gelê Kurd bibe ronahiya hebûneke bi rûmet û rêzdarî?!

Heypeyvîn bi endamê Meclîsa Neteweyî Robîn Rewşen re:

'Armancên grevê pêk hatin'


Armanca greva birçibûnê çi bû, we çî dabûn pêşîya xwe, bûn çiqas gihîştin armancên xwe û kêmasî çî bûn?

- Piştî êrişkirina dewleta Tirk a ser başûrê Kurdistanê, vegeyriyan bakurê Kurdistanê û bi navê "Îç harekat" (tevgera hundirin) dest bi qirkirina gelê Kurd kirin. Gund û bajarên Kurdistanê hatin bombebarankirin. Amadekariyên xwe yên Newrozê, ji bo qirkirinan dikirin û hê ji dikin. Em ji, ji bo rê li ber van amadekari û daxwaziyan dijmin bigirin û di qada navneteweyî de wê jenosîdê bidin xuyakirin (teşhir bikin) û bala raya giştî a Ewropa bikişînin, me dest bi greva birçibûnê kir.

Ev livbaziya me di qada navneteweyî de, gelek deng da. Bi pirrani armancên me pêk hatin. Di warê televizyon, çapemenî û raya giştî de, gavên mezin hatin avêtin. Di warê diplomasiyê de hinek mewzî û fersend bi dest ketin. Kêmasiyên zaf girîng derneketin. Lê ji ber ku, cihên me yên greva birçibûnê têrî daxwaziyan gel nedikirin, mixabin cih biçûk bû. Ji ber wî, ji xeynî 700 kesi, bi hezaran welatparêz paşve çûn.

Em endamên Meclîsa Neteweyî, me nikaribû li ber van qirkirina bê deng bimînin û bi van çalakîyan xwe em bê deng neman û namînin ji.

Ji destpêka greva birçibûnê heya dawî, li Kurdistanê û Tirkîyê hin bûyer çêbûn. Her wekî êrişê dijmin a li ser Girtigeha Diyarbekirê. Hûn li ser van çî difikirin û çiqasî



Robîn Rewşen

girêdayî greva birçibûna parlamentê neteweyî bû?

- Berî ku em dest bi greva birçibûnê bikin, bangêkî me çêbû ji Kurdîstaniyan re, ji bo piştgiriya me bikin û tevî greva birçibûnê bibin. Li welat û derî welat bi milyonan gelê Kurd bersiva banga me da. Wek minak mirov kare bibêje, şoreşgerên ku di girtigehên Kurdistanê û Tirkîyê de ne, ji bo piştgiriya ketin grevên birçibûnê. Li gelek cihên Kurdistanê dukan hatin dadan. Dewleta Tirk ji, ji bo pêşî li ber van piştgiriyan bigire û bala raya giştî ji ser çalakîyan me hilde, êriş bir ser Girtigeha Diyarbekirê û gelek cihên din. Ji bo tesîra greva birçibûnê bê şikandin, gelek tiştên din hatin kirin, ev ji normal in. Ji ber ku, kengê me çalakîyek kiriye, dijmin ji dest bi çalakîyan xwe kirine.

Bi van politikayên xwe dijmin çiqas bi ser ket?

- Dijmin xwest li Brukselê ji livbaziyan me sabote bike. Lê bi ser neket. Ji destpêka şerê rizgarî ya neteweyî û heyanî niha, taktikên dijmin bi ser neketiye. Her tim ên bi ser



Mebûsên Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê bi hev re

dikeve em in.

Çi piştgiriya dewletan û Kurdên li Ewropayê çêbûn?

- Di gelek waran de, piştgiri çêbûn. Li Avusturalya, Kanada, Moskov û hemû welatên Ewropa, grevên birçibûnê çêbûn. 21 hezar serdanan hatin serdana me. Ji vana çar hezar biyanî bûn. 150 hezar marq alikariya ya diravî (pereyî) çêbû. Ji derî vanan, heyetek parlamentê ji Grekland (Yewnanistan) ê û serokê dêr (patrîk) ên Grekî (Yewnanî) hatin serdana me. Ji Parlamentoya Ewropayê Koma Keskesor, ji Parlamentoya Eyaleta Hambûrgê komek parlamentê, ji Parlamentoya Belçîqayê 15 parlamentê hatin serdana me. Parlamentêrekî Belçîkî Hugo Van Rampaey, sê cara di dawîya heftîyan de bi me re kete grevên birçibûnê.

Di heypeyvîna we ya Radyoya Serxwebûnê ya Stocholmê de, we qala keşîşek dikir. Hûn ka-

rin bi kurtî ji me re ji qala wî keşîşê bikin?

- Ew keşîş Holandî bû. Endamê rêxistineke aştiyê ye. Ji roja yazdemîn heya dawiyê bi me re di greva birçibûnê de bû. Ez dixwazim di nav kevane (heyvikê) de bi taybetî behsa wî keşîşê bikim: Dema dewleta Holandayê balefirê şer û çekan difiroşe dewleta Tirk, ev keşîş bivirê xwe digire û diçe balefirgehê û bi bivirê xwe êrişî balefira dike û tekêlên wan diteqîne. Wekî din, paletên çil tanqan dişikîne. Li ser wî wî digirin û du salan di girtigehê de dihêlin.

Birçimayîna bist û pênc rojan, li ser mirov çawa tesîr dike?

- Bi rastî weke ku em qet birçî nebûn. Birçibûn, nedihat hişê me. Ji ber ku livbaziyan me encam digirtin, daxwaziyan me pêk dihatin, piştgiriya gel gelek mezin bû. Ev tişt tev ji me re dibin moral û hêzeke gelekî mezin. Ev tişt

me têr dikirin.

Her wekî ku tê zanîn, di rojevê de damezirandina hikûmeta şer heye, di wî warî de çî amadekariyên we heye?

- Belê ji bo ku, hikûmetê damezirandin, divê meclîsê civîna xwe çêke û xwe ilan bike. Ew ji di demê kin de wê çêbibe. Niha xebata me li ser wî babetî ye.

Ji derî greva birçibûnê çî livbaziyan we çêbûn?

- Roja 24'ê greva birçibûnê, nûnerên gel û tevî hevalên di greva birçibûnê de, ber bi parlamentoya Ewropa ve em meşîyan. Du endamên Meclîsa Neteweyî û berpirsiyarekî ERNK'ê, bi Serokê Parlamentoya Ewropa re rûniştin. Ji vir çendekî berê 15 parlamentêrên Swîsre (Îsvîçre) û Parlamentoya Ewropayê, ji bo çek danîne bangêkî li dewleta Tirk û PKK'ê kiribûn. Di wê rûniştinê de, nameyek ji alî komîteya navendî ya PKK'ê ku bersiva çekdanîne bû, pêşkêşî Serokê Parlamentoya Ewropa dikin û armancê daxwaziya greva birçibûnê jê re dibêjin.

Wekî din, bi balyozxaneyên (konsolosxaneyên) biyanî re, hevdiyan me çêbûn. Ji serrokkomar û serokwezîrên wan re bi destê balyozxaneyan, me nameyan şand. Parlamentoya Ewropa ji soz da ku wê di mehê Gulanê de wê heyetek parlamentêrê bişînin Kurdistanê. Parlamentoya Belçîqayê, wê heyetek ji 15-20 kesi bişîne Kurdistanê û Vatikanê jî, wê heyetek ji dêrê bişîne Kurdistanê.

Heypeyvîn: Salar Amedî

Ji bo vegera we

R. Cizre

"Hesabê malê û çarşiyê (sûkê) li hev nayê." Îro, bi hezaran Kurd di metropolên Ewropa de, di bin nîrê nexweşî û zoriyan giran de, jiyana xwe didominin. Bi dehan mirovên Kurd di kampên penaberan (multeciyan) de, ji tenemayîne, hesreta welat û psikolojiya biyanibûnê, mejiyê xwe winda dikin. Dibin dilîyan xewnên xwe yên vala û li ber deriyên (Sosyal am) ê -Daîreya dayîna alikariyê- rezil û riswa dibin. Dû re ji dewlet wan dikin nava kategoriya dinan. Gelek mirov ji, di nava malê, febrîke û dibistanên bi zorê de dibin robot. Hinek ji,

dolabên wan digere, din û imanê wan dibe pere, her rojê zêdetirê 16 saetan kar dikin. Kategorîyêke pirr hindik ji, ticareta siyasetê dikin.

Kulmeke mirovên ji nava civakê hatine avêtin ji, bi metodên dizî talankirina hebûnên gel, xwe dikin "nivîs"kar û bi teoriyan vala xwe "qehreman" û "şoreşgerên herî radikal" nîşan didin.

Ev tablo bi destên generalên dewletên dagirker û şebekeyên xayîn ên mirovan ji welat derdixin, hatiye kişandin. Ji welat derxistina mirovan, parçeyekî girîng yê şerê taybetî ye, li dijî gelê Kurdistanê. Dijminên me ku bi tanq û topan nikaribûn

welatê me vala bike, niha di bin hoyên rewşa ekonomî ya zor de, dixwaze bigihîje wê armanca xwe. Belê, êdî ev tişt nikare bike. Li welatê heza ku dizane hesabê wan bide peyda bûye û otorîteya xwe ya neteweyî ava kiriye.

Li Ewropa jî pêşîya ji rê derketina gel hatiye girtin. Eger çend mirov xwe dikin aletên siyasetê dijmin, bi hezaran ji li dora ala ERNK kom dibin, şerê li welat xurt dikin û her rojê bingeha vegera xwe amade dikin.

Erê, ez wê nivîsa ku hîna temam nebûye diyarî roja vegera hemû Kurdên li derve yî welat dikim.

'Em çima li Kurdan xwedî dernakevin?'

Pirsgirêka Kurdî, di parlamentoya Yewnanistanê de, hate munaqesekirin. Mebûsê PASOK'ê Teodors Kokolidis, ji bo bersivandina Wezîrê Karên Derve pirsnameyekî pêşkêşî meclîsê kir. Teodors Kokolidis di pirsnameya xwe de, wê pirsê dike: "Gelo Yewnanistan çima alikariya Kurdan nake?" Pirsnameya Kokolidis wîha didome: "Sala 1992'an ji bo Kurdan bûye sala tarî. Rewşa îro bi qetlîam, kuştin û koçberkirinê, ji dema 1925-39'an diwartir bûye. Dewleta Tirk, daxwaza mafên Kurdan bi xwîne bersivand. Li ser Kurdan politikayên kemalist tene meşandin. Hebûna Kurdan, çanda wan, bi kurtî her tiştê wan tê inkarkirin û herkes Tirk tê hesibandin."

Teodors Kokolidis, di pirsnameya xwe de, ji kirinên dewleta Tirk minakên girîng dide û pirsnameya xwe bi wê pirsê diqedîne: "Hikûmeta Yewnanistanê, çima heta niha alikariya Kurdan nekiriye? Gelo ji dewleta Tirk ditirsin?"

Civîna Kurd li Stenbolê di 27 Sibatê de çêdibe

Însiyatîfa esnafên biçûk

Lê ev ne ew esnafên ku li Kurdistanê kepengan digirin in

- Her çiqas navê wê "Însiyatîfa Rewşenbîran" be jî hûn ji herkesî baştir dizanin ku, hûn însiyatîfa dewletê ya bi peyva Kurd makyajkirî ne.
- Ew perdeya dewletê ya ku, we xwe li pişt veşartîye, jî ber rûyê xwe biavêta, we yê ditiba ku gelek însan hene we ronahî bikin. İhtiyacıya we bi vê heye.

Mem Baran

Di pêvajoya hemû têkoşinên rizgariya neteweyî de rewşeke wiha heye. Çiqas cara ku hêzên serdest dikevin nav neçariyê û tîk diçin, hewl didin ku, di hundir de ji xwe re hevkar û mutefîkan çêbikin. Ji ber ku şerê dagirkeran ne mîrani ye. Herdem şerê qirêj dimeşin. Dagirker kesên paşverû yê ku di şertên normal de biçûk dibine û di perçiqîne, di şertên cengê de, ji yê tîkoşer vediqetîne û rûmeteke taybetî nişani wan dide. İmkanên jiyane jî bo wan zêde dike û wan xwedî dike.

Evdilhemîdê II. jî bo rûniştandin û zeximkirina otorîteya xwe ya merkezi û pêkanîna politikayên xwe yê panislamîst "Alayên Hemîdîyan" ava kir. Ew "Alayên Hemîdîyan" dema dirêj li Kurdistanê bûn çavkaniyên zordarî û terorê û li pêşîya tîkoşîna Kurd a neteweyî bûn asteng. İro li Kurdistanê rewşeke ku dişibe ya wê demê her tim di rojevê de xwe dide xuyakirin.

Di cinayetên herî qirêj de ên ku li hember gelê Kurd tene kirin, imzeyê cerdevanên dewletê yê bi meaş heye. Dewleta Tirk niha jî, bi kinc û nasnameyên cihêreng li pey zêdekirina van birrên hevkar û xayin e. Tîştên ku bi destê xwe nikare bike, bi destê kesên Kurd ên ku di nav sistemê de girtine, dide kirin.

Sempozyûma Kurd a ku vê

hefteyê (27 Sibata) wê li Stenbolê li dar bikeve, bi destê Kurdên hevkarên dewletê tê tertîpkirin. Ev sempozyûma ku bi navgîna birrek esnafên Kurd ên biçûk ku, xwe mîna "Însiyatîfa Kurd ên Rewşenbîr" didin pêşkêşkirin tê li dar xistin, wek realîteya Kurd tê binavkirin.

Dema em vê fealiyeta wan a "Însiyatîfa Rewşenbîran" wek "însiyatîfa esnafan" dinirxînin, divê xelet neyê fêmkirin û ew, bi esnafên Kurd ên ku di tîkoşîna Rizgariya Neteweyî ya Kurdistanê de roleke pêşverû dilîzin re, neyên tevlihev kirin. Bi rastî jî, esnafên Kurd bi can û malên xwe ve, xwe dane

doza neteweyî.


Lê ev kesên ku, ji xwe re dibêjin "Rewşenbîr" û em wan wek "esnafên biçûk" bi nav dikin, bi listikên siyasî yê erzan, bi qurnaziya gundîtiyê û bi siyasîyên xwe yê feodal dibin esnafên biçûk.

Gava em li kar û barên wan ên esas dinêrin, zehfê wan îhalekar, komîsyonvan, manîfaktûrefroş an jî berdevkên Kurdên ku xwe bi pereyên penaberiyê xwedî dikin in.


M. Can Yüce, di rojnameya Gündemê de bi mafdarî ev pirs ji wan dikir: "Ev zilamên han ji xwe re dibêjin "Rewşenbîr". Kijan ji wan di çî babetî de pispor e? Bila bibêjin kî ji wan, di kîjan warî de xwediyê xebateke zanistî ye? Li holê, berhemeke kijan ji wan heye?

Berhemê deynin aliyekî, kî ji wan, heta îro bûye xwedî gotar, an jî fikrêkî nivîskî?

İro, dema li aliyekî, rewşenbîrên Kurd ên rastîni yê di bin lûleyên dewletê de şerê



Yaşar Kaya vexwendiyê sempozyûmê ye. Murat Belge jî wê teblixê bide.



kulturê dimeşin, nikarin jiyana xwe bi serbestî bidomînin, li aliyê din, ev esnafên biçûk ên ji xwe re dibêjin "Rewşenbîr" bi pereyên kê di otelên luks de sempozyûman çêdikin?

Lê ku em li navên van kesên beşdarê sempozyûmê mêze dikin, hingê cewaba vê pîrsa li jor, bi hêsani tê ditin. Ev kesên ku, di nav "însiyatîfa esnafan" de cih digirin û ji xwe re dibêjin rewşenbîr, xwedêgravî bi eslê xwe Kurd

in, bes di rastiyê de ew ên teblix pêşkêşî sempozyûmê dikin tev rewşenbîrên Tirk, qelemên xwe jî bo dewletê bi kar tinin û dixwazin qulên ku di rejîma kemalist de vebûne, tamir bikin.

Li gor nivîsa A. Zekî Okçuoğlu, a di rojnameya Azadî de, esnafên me yê biçûk û erzan, Kurdeki ku dikaribe teblixekî pêşkêşî sempozyûmê bike, peyda nebûye. Li ser vê yekê, Okçuoğlu dipirse: "Vêca hûn kî ne?" Di ser de jî, Walî Kozakçıoğlu yê kontrollerilavan her curê imkan û garantiyê jî dide we. Yanê li meydana tu talûke jî, ji bo we tune. Çima hûn hunerên xwe nişan nadin.

Lê heqê we jî heye, ji ber ku hûn Yekitiya Komara Tirkiyê, ji kekê xwe yê mezî Murat Belge çêtir nikarin biparêzin. Cihê ku ew lê ye, heqê guhdarîkirinê para we dikeve.

Her çiqas navê wê "Însiyatîfa Rewşenbîran" be jî hûn ji herkesî baştir dizanin ku, hûn însiyatîfa dewletê ya bi peyva Kurd makyajkirî ne.

Ew perdeya dewletê ya ku, we xwe li pişt veşartîye, jî ber rûyê xwe biavêta, we yê ditiba ku gelek însan hene we ronahî bikin. İhtiyacıya we bi vê heye.

Sempozyûma însiyatîfa 'Kurd'

Di 27ê Sibatê de bi navê "Realîteya Kurd" wê li Stenbolê sempozyûmek li dar bikeve.

Sempozyûma ku ji aliyê hejmarek kesên ku xwe wek "Însiyatîfa Rewşenbîrên Kurd" bi nav dikin, tê tertîpkirin, ji aliyê kesên girêdayî partiyên siyasî yê Tirk û kesên reformîst ve tê destekkirin.

Ji nivîskar û hunermendên Kurd û Tirk 324 kes vexwendiyê sempozyûmê ne.

Ji HEP'ê Ahmet Türk, M. Emin Sever, Remzî Kartal û Leyla Zana ku vexwendiyên sempozyûmê ne, beşdarê sempozyûmê nabin.

Remzî Kartal li ser sempozyûmê vê daxuyaniyê dike: "Ev sempozyûma bi navê realîteya Kurd, tevgerêk li dijî HEP'ê ye em beşdarî tevgerêk li dijî xwe nabin."

PKK jî, bi çavêkî baş li vê sempozyûmê nanêre û van kesên di nav vê tevgera "Însiyatîfa Rewşenbîrên Kurd" de cih girtine, wek reformîst û hevkarên dewletê dinirxîne û

rexneyên giran li wan dike. Li gor PKK'ê, ev listikeke dewlet û hevkarên we ye. Armanca wan ew e ku, gerîla bidin sekinandin. Di nav kesên ku beşdarî sempozyûmê dibin de, jî Yahudiyên dewlemend bigirin ta reformîstên Tirk, jî mebûsên xwesêr bigirin ta temsîlciyên partiyên siyasî yê Tirk û alîgirên Riya Azadî û KDP'ê mirovên cur be cur hene. Navên hin

vexwendiyên sempozyûmê ev in: Fehmî Adak, Ziya Acar, Adalet Ağaoğlu, İshak Alaton, İbrahim Aksoy, Mahmut Alınak, Şahin Alpay, M. Ali Aslan, Sadun Eren, M. Ali Aybar, Melih Aşik, Ergun Balci, Mahmut Baksî, Salih Sumer, İsmail Beşikçi, Halil Berktaş, Günerî Cıvaoğlu, Abdurrahman Dîlipak, Şükrü Elekdağ, Jak Kamhi, Müjdat Gezen, İbrahim Güçlü, Haşim Haşimî, Yaşar Kemal, M. Kotan, Naci Kutlay, Menduh Yaşa, Ertuğrul Özkök, Şanar Yurdatapan, Yaşar Kaya, S. Sakik.

Hilbijêrîna Komeleya Esnafan a Giştî ya Bazarvanên Stenbolê çêbû

Hilbijêrîna bi hîlebazî

Zana Farqînî

Hilbijêrîna Komeleya Esnafan a Giştî ya Bazarvanên Stenbolê, bi awayekî teşqeleî û bi xire cir hate kirin. Polisan sê caran êrişî esnafan kir û ew dan ber jopan. Serokê nû disa Ceyhûn Akkaş hat hilbijartin.

Hilbijêrîna Komeleya Esnafan a Giştî ya Bazarvanên Stenbolê, di 21.02.1993'an de li navçeya Bakirköy, li Parka Zuhuratbaba hate kirin. Hilbijêrîna bi sê listeyan hate kirin, lê dawiyê İbrahim Avcî listeya xwe kişand. Hilbijêrîna di nav listeya serokê kevin Ceyhûn Akkaş û Ali Akdiş de

derbas bû.

Dijberên Ceyhûn Akkaş di peyvandinên xwe de ew bi hilekari û bi kirinên qirêj tewandar kirin. Li gor dijberên wî, wî hilekariyê kiriyê û kesên ku qeyd û sicilên wan di Komeleya Esnafan de nin e, bi wan ray avêtîye. Ew kesên ku Serokê kevin Ceyhûn

Akkaş ew anîne, ji Komeleya Şofêran e.

Hejmara kesên bi qeyd a Komeleya Esnafên Bazarvan a Stenbolê, 17448 e. Lê bi tenê ji bo hilbijêrîna destûr dabûn kesên ku piştî sala 1984'an qeyd û sicilên xwe çêkirine. Ev yek jî, ji aliyê kesên welatparêzên Kurd ku listeya Ali Akdiş destek dikirin, bi awayekî nijadperestî û rêlibergirtina kesên Kurd hat nirxandin.

Li gor xala jor, sicila 9200 endamên komeleyê hebûn. Lê bi tenê 568 ray hatin avêtin. Ji van

rayan 2 ray jê nelê hate qebûl kirin.

Listeya Serokê kevin Ceyhûn Akkaş, bi 330 rayî bi ser ket. Listeya Ali Akdiş ku kesên welatparêz li dor wî, li hev civiyabûn, 238 ray stand.

Hilbijêrîna ji destpêkê heta qedandinê di hewayeke tund de bûhurî. Polis li ser protestokirina esnafan û li hemberderketina qaydayê hilbijêrîna, sê caran êrişî esnafan kir û ew dan ber jopan. Car caran jî, salon ji alî polisan ve hate valakirin.

Bi qumandarê Herêma Çaremîn a Eyaleta Mêrdînê Îsmâil re hevpeyvîn - 2

'Ji xwe re stargehan çêbikin'



Qumandarê gerîla Îsmail, dibêje ajantiya dewletê li vê hêlê kême.

Ev tiştê hûn dibêjin, yanî kontrgerîla li bizb-i kontra li gelek deverên din, li Nisêbinê, li Cizîrê û hwd ji hebûn. Li wan deveran çawa kontra êrişê dirin ser kesekî, ji aliyê mîlet ve dibatîn dorpeçkirin û liçkirin, yanê gelê wan deveran bi xwe dest avêtin wê meseleyê, li hev xwedî derketin, wê ji wê li kontrayan girt û çê bi besani derfet nabînin wan êriş û cinayetên xwe pêk bînin. Batman, ji wê aliyê ve pîr qels e, li xwe xwedî derketin.

- Vêga di navbera Nisêbin, Cizîrê û Batmanê de, hem ji aliyê hejmara mirovan ve hem jî, ji aliyê cografîya ve ferq heye. Wekî din, giringiya ku dijmin dide Batmanê, ne dide Nisêbinê, ne Cizîrê û ne jî deverêke din.

Li aliyê din, li Nisêbin û Cizîrê û deverên din mîlet hevûdin nas dike û yekîtiyê xurt di nav gel de heye. Dema kesên xerib û xerab dikevin wan deran di eih de ten naskirin û li hember wan tedbir ten standin. Di hundirê Nisêbinê de, i-ro bi sedan polisên sîvil hene, lê mîlet yekê yekê gişan nas dike. Li bajarekî wek Batmanê ev ne mumkun e. Naskirina kesên xerib an jî polisên sîvil pîr zor e. Ji her devere, her cure insan hene di Batmanê de.

Erê, peşî li Batmanê miraseke

baş hebû, lê piştî 80'yan têkoşin demek sekini an jî sist bû. Vê ji tesîreke negatîf li Batmanê kir. Li Nisêbin û Cizîrê têkoşin qet neskini. Ev dever pîr nêzîkî çiyayên Botanê ne û gerîla tesîreke direkt herdem li wan kiriye. Batman dûriyan bûyeran bû, şerê gurr hinek jê dût bû, dengê fişekan bi xurtayi nedihate Batmanê.

Li aliyê din, dijmin xebatên xwe ji Batmanê qet qut nekir û dixwest Batmanê bike wek merkez ji xwe re. Ev planê dijmin dibe ku hê jî didome.

Dewlet jî bo çî dixwaze Batmanê bike merkez ji xwe re? Ji bo ku şiyarbûn û serhildanên Batmanê di eih de bipêçiqîne. Batman bajarekî karkeran e. Di Kurdistanê de bajarê herî mezin e ku karker tê de eih girtine Batman e. Dijmin jî wê yekê baş dizane. Zane ku, dema PKK eihê xwe di vi bajarî de baş bigire, ne Batmanê tenê, wê tesira xwe li derdorê xwe jî bike, heta Diyarbakir, Ruha û gelek deverên rojavayê başûr wê di bin wê tesîrê de seri hildin.

Ji bo rastkirin û ji nû ve bidestxistina Batmanê, weke çare hûn çî dibînin?

- Jixwe heval bi xurtayi li ser di-sekinin, Batman ne girêdayî me ye, ew girêdayê Eyaleta Xerzan e. Lê

em dizanin ku parti bi rengê xurt li ser disekine, gerilayên gihiştî û pîr çeleng ketine Batmanê û dest bi xebatên xwe kirine. Hem hêdi hêdi wê livbaziyan (eylemên) xwe zêde bikin, hem jî di taxên Batmanê de komite û itifaqan diafirin. Bi vî rengî, em bawer in wê di demêke kurt de hem yekîtiya mîlet wê bê afirandin, kesên xerab û kontra bi nav û navnişanên xwe ve bîr tesbitkirin û li hember wan wê tedbirên lazîm bîr standin. Ev jî wê cesaretê bide gelê Batmanê û wê ji nû ve şiyar bibe û bi xurtayi tevî têkoşina şoresê bibe.

Lazîm e gelê Batmanê jî, bi temami dev jî sersariya xwe berde, li hemberî êrişan bê tewir nemîne û di wê zanîne de be ku, ev problem a wan gişan e.

Li Kurdistanê, gundi di nav bevdanên mezin de ne, ji bo têkoşina şoresê bi pêş ve here. Lê karker û memûr, wisa xuya dike ku zêde serê xwe bi şoresê re naşînin. Hûn li ser wê çî difikirin?

- Jixwe jî bo karkeran politikaya me kifş e, partiya me partiya karkeran e. Li ser ideolojiya karkeran, PKK xebatê dike.

Bi giştî li Kurdistanê karker xwe baş nas nekirine, lê rewşa wan pîr ne xerabe jî, ji bo karkerên wê herêmê jî, ez dixwazim wê bibêjim: Heta niha em û wan hinek jî hev dût bûn. Lê niha em hêdi hêdi nêzîkî hev dibin. Divê zanibin ku, ev têkoşin êdi zehf jî bo wan tê kirin. Hinek jî wan, bi meaşê ku dijmin dide wan carna xwe û çîna (sî-nîfa) xwe, jî bir dikin. Weke tê zanin, i-ro di Kurdistanê de, çî karker, çî jî memûr du meaşan distinin, yek meaşê wan e yek jî, yê xwina şehîdan e. Ev meaşê zêde hinek jî wan jî şexsiyeta wan dût dixê.

Lê jî niha û pê ve, em komiteyan di nav hemû karkeran de dadimezirinin û bi navgîna van komiteyan wê yekîti di nav wan de bê xurtkirin û wê ber bi têkoşinê ve bîr kişandin.

Weke tê zanin Yekîtiya Karkerên Kurdistanê heye, ev li Ewropa eihê xwe digire. Planek li pêşiya

me heye ku, em yekîtiya hemû karkerên Kurdistanê bi wê rêxistinê ve girê bidin.

Em werin ser memûran: Dema şoresê xurt be, ew bi şoresê re ne, dema dijmin xurt be, bi dijmin re ne. Ev jî taybetiya çîna wan tê. Memûrên wê hêlê jî, an wê bikevin bin otorîteya partiye, şert û şîrûtê me qebûl bikin, tiştê ku feyda dide dijmin nekin, an jî ku bi vî rengî nemeşe lazîm e istifa bikin. Divê jî bir mekin ku, têkoşina me roj bi roj xurt dibe û dijmin hem jî aliyê ekonomîk û hem jî, ji aliyê leşkerî ve derbeyên mezin dixwe. Ji ber wê jî divê memûr bi çend qurûşên ku dijmin dide wan nexapin. Ev dijminê ku meaş dide wan, em bawer in ku, zehftirin heta salek an jî du sale din wê jî mecbûrî dev jî Kurdistanê berde û nema karibe vî meaşê bide wan. Hingê emê bimînin, xwe bi xwe. Ji ber wê yekê durusbûn û welatparêziya ku memûr jî niha ve bikin wê jî bo menfaeta wan be jî.

Ji bo herkarên dewletê û ajanan di sala 93'an de programên wê yê taybetî bene?

- Ew ajantiya direkt li wê herêmê pîr kême bûye. Heta berî du sê salan, têkiliyên mîlet bi dijmin re zêde hebû. Di sala 92'an de, hejmara wan kesan jî tiliyên destan ne zêdetir bûn. Me niha dest bi girtina wan jî kiriye. Navê wê kirina me "operasyona li hember ajana" ye. Kesê bi awayê direkt an jî indirekt zerarê bidin gel, wê bîr girtin û li gor sûcê xwe wê bîr cezakirin.

Li aliyê din, xerabi an jî ixbara bêzanebûn, bêhemd heye. Yanî, gelek caran şitexelî şitexeliyê dikîşîne û digihîje dijmin.

Ev jî ber bêdiqetiyê ye, em li ser wê jî disekin. Dema her gundek bibe wek malbatek û jî kesên din re behsa wezîfa xwe û behsa rê û rêbîhuran nekin, hingê ger ajan jî hebin nikarin rola xwe bilizin.

Li aliyê din, hin kes li Misirê, Bişîriyê û Eskifê hene, hem xwe bi me re dost nişan didin, hem jî destê wan di destê dewletê de ye. Em jî wan re jî dibêjin, bila aliyê xwe kifş bikin. Ji wan kesan jî zehf kes ten cem me, ji bo xwe bidin efkirin.

Heta niha ajanti, hevkarî pîr zerar daye me û gelê me, ji ber wê jî emê jî niha û pê ve bi rengê dijwartir li ser wê problemê rawestin. Çî ajanên gundan, çî yên bajaran yekê yekê jî aliyê me ve ten tesbitkirin û xelasiya wan jî destê me nin e. Heta i-ro rêxistinên me li wê herêmê qels bûn, wê rewşê jî karê ajanan hêsan dikir, lê vêga em li her der birêxistin in û di van sertên nû de, imkana xelasiya ajan û hevkaran nema ye. Ku disa jî, dev jî vî karê qirêj berdin, emê wan efû bikin, nexwe cezayê wan kuştin e.

Li Kurdistanê, di van mehdan dawi de, li ser kadroyên kar pîr xerabdan çêdibin. Hûn kes kadroyan tînin difroşin. Hûn wê meseleya kadroyan çawa dinûrxinin?

- Ev mesele berê jî hatibû rojevê. Dîtinên partiye jî li ser wê meseleyê hene. Dijmin evqas kadroyan jî bo xortên Kurd jî xwe re bike dost û bi xwe ve girê bide derxistiye holê. Li Kurdistanê ev kadro bi destê kesên girêdayî partiyan wek ANAP û DYP'ê ten firotin.

Zehf van kesan, xerab û navdar in. Dixwazim bi şekli mîlet bi van partiyan û bi xwe ve girê bidin. Ev kes jî aliyê me ve hatine tesbitkirin, wê hesab jî, jî wan bê pîrskirin.

Li aliyê Cizîrê û Hezêxê, mîlet van kadroyan jî xwe re wek navgîneke xwedikirinê dibînin, jî bo wan meaşê dewletê ne armanç e. Lê li wê herêmê li dora Misirê zehf mîlet vî meaşê wek hêvi û armançek dibînin, ev jî tiştê pîr xerab e.

Ew kesên ku van kadroyan jî xwe re dikin armanç û wek hêviyêke xelasiyê dibînin, wê ev kadro bîr belaya serê wan.

Dawi li ser rojnâmeya Welat hûn çî difikirin û çî gotinên we jî xwendevanên Welat re bene?

- Zimanê welat zîmanekî xweş e. Zehmetiyên mezin li gor me di nav de tune ne. Mumkun e car caran gotinên neyên fêmkirin tê de hebîn, lê bi fîrêhî hertîşt di hundirê Welat de tê fêmkirin. Ger mîlet wê taqîb bike em bawer in Welat dikare roleke mezin bilize. Hem yekîtiya zîmanê me pêk tîne, hem xerabî rast dide, hem jî heqiqet û dîroka mîletê Kurd pê dide zanin. Bi taybetî jî, di demêke dawîna ku şerê çekdar bi xurtayi tê dayin de, Welat jî bo gelê Kurd ihtiyaciyeke giring e. Em bangî gelê xwe dikin ku, rojnâmeyên Tirk nexwinin, TRT û radyoyên wan jî guhdari nekin.

Wê bi vî awayî hem jî aliyê ekonomiyê ve derbe li dewletê bixê, hem jî wê bibe tewreke siyâsî ya protestokirina dewletê. Niha PKK jî dest bi emisyonê (weşana) radyoyekê kiriye. Ev radyo "Dengê Kurdistanê Serbiyê" ye û sibehê di navbera saet 9-10'an de, piştî nîvro jî 3-4'an de dikare bê guhdarkirin. Di pêla 2. ya kurt de li ser frekansa 700 an derdikeve. Em jî mîletê wê herêmê tiştêkî din jî dixwazim, lazîm e jî niha ve jî xwe re stargehan (parêzgehan) çêkin. Dema dijmin bigire ser wan ve, jî bo xwe karibin biparêzin.

Demê dijmin tiştêkî jî we xwest, hûn berevajiyê wê bikin. Mesela ku bixwaze hûn lembeyên xwe bitelînin, divê hûn gîs lembên xwe pê bixin û vekirin bihelin.

Piştî hevpeyvîne em bi neh-deh heb gundiyan re rûniştin û heval Îsmail bi wan re ketê sohbetê. Di nav sohbetê de yekê behsa çandîniyê kir. Îsmail, jî nişka ve hers bû û got: "Malaya, hûn çiqas mirovên eceb in, bi şev û roj hûn behsa nok û nîskan dikin, qet nebe saeta ku gerîla li cem we be, behsa nok û nîskan nekin, hinek jî li ser şoresê, serê xwe bişînin."



Gerilayên herêma 4. bi gelê herêmê re têkiliyên xwe roj bi roj germtir dikin.

Neq




Rewşa mirov ya herî xerab,
dema ku nikare bi îradeya xwe
hereket bike ye.

Montaigne

Gelî jinên Kurd!

Guh bidin banga dewletê 'ZAROKAN ÇÊNEKIN'



Heyeta Koordinasyona Rêveberiya Taybeti (Olağanüstü Hal Koordinasyon Kurulu) di civîna xwe ya dawî ya li Enqerê de, sedemê pirsgirêka Kurdî keşif kirin: Zêdebûna anormal a şênîyê (nifûsê). Li gorî ku ji rojnâmeyan tê fêmkirin, ev heyet ji bo rêlibergirtina zêdebûna nifûsa Kurdan, programek amade kiriye û dê ev program ji 3'yê Adarê pê ve li Kurdistanê bê meşandin.

Xuya ye ku, dewlet ji bo tune kirina Kurdan, riyên nû diceribîne. Li aliyekî, bi hêzên xwe yê eskere û veşarî qetliamên girseyî dimeşîne, li aliyê din, bi hemû derfetên (imkan) xwe siyasetên asimilasyonê pêk tîne û Kurdan mecbûrî koçberiyê dike, niha ji dixwaze nifûsa Kurdan bike bin kontrola xwe.

Di rastiya xwe de, li hemû civakên serbixwe, ji bo kontrol kirina nifûsê metodên modern tene ceribandin. Ev ji bo tendurustiya (siheta) civakê tê bikaranîn. Lewre li hemû dinyayê bê kontrol zêdebûna nifûsê, pirsgirêkên girîng derdixin holê. Ji ber vê yekê jî, di civakên modern

de, disa bi awayên modern, kontrola zayînê bi destê sazîyên ilmî tene meşandin. Lê, li welatên ku di bin dagirkeriyê de ne, rewş ne wiha ye. Li welatên mêtîngêh metodên wiha ji bo tune kirinê tene bikaranîn. Ji bo mînak, programeke wiha, bi hevkarîya Îngiltere û Brezîlyaya li hember çermSORÊN (yerlî, kizilderilî) Brezîlyayê hatibû meşandin. Li gorî vê programê, di nav 15-20 salan de, bi dehhezaran jinên çermSOR, ji bo nebin xwedî zarok emeliyat kirin. Di pêvajoya 20 salan de, nifûsa çermSORAN ji sedî not kêmtir bû. Niha ber bi tunebûnê ve diçin. Diyar e ku ev program ne ji bo tendurustiya civaka çermSORÊN Brezîlyayê hatine meşandin. Ev raste rast, bi metodên "modern" tune kirina geleki ye.

Rayedarên dewletê di beyanên xwe de dibêjin ku, nifûsa Kurdan ji yê Tirkan bi leztir zêde dibe û ev jî mîzîne (denge) xera dike. Di rastiya de, dixwazin bibêjin, "Va ye Kurd bi kuştinê xelas nabin, divê av ji kaniyê were birrin." Apê

Musa di nivîseke xwe de (TÎR- Weqfa Vehbî Koç-Hejmar:5- 21-27 Adar 1992) qala vê meseleyê dike û bi zimanê xwe yê şîrîn û tinaz armanca Weqfa Vehbî Koç dinirxîne. Apê Musa wiha dibêje: "Weqfa Vehbî Koç bi milyaran hebên ku pîrek pê bi hemil nebin, belaş şandin Kurdistanê. Lê mezinên Kurdan jî, li Kurdan tembîh kirin, gotin, 'Gidî van heban nexwin lawo, bi van heban hûnê êgir berdin mala me û hûnê bizrê me biqelînin û ji alîkî de jî, wê pîrekên me giş bibin qanser.'" Apê Musa wiha didomîne: "Ez niha dinêrim tu dibê qey derdekî Tirkîyê nemaye ji zarokên Kurdan pê ve. Rihê wan dere."

Rayedarên Tirk, zêdebûna nifûsa Kurdan, mina talûkeyekê dihesibînin. Li gorî wan, her zarokekî Kurd ku tê dinyayê gerilayekî potansiyel e û ev jî mîzîne(!) xera dike. De hûn li hêviya çî ne dayikên Kurd? Hûn hinekî din jî, bi hêz bixebitin, hûn dê mîzîna dinyayê jî xera bikin.

Nîjad Yaruk

TÎR

Musa Anter



Aqilê Uğur Mumcu

Kuro, bê henek mirov carna ji hin însanan hêviyekê dike, lê mirov dinêre ku yê xelet ne ew in, mirov neheq e. Ji ber ku mirov nizane ew ne tiştek in. Mesela îsal çend sal e, me digot, nivîskarekî Tirkîyê, bi aqil, ciwanmêr, hevalê feqîr û fuqaran çêbûye, mala Xwedê ava. Lê, em dinêrin ku em car din hatine xapandin.

Erê, li Tirkîyê nivîskarên bi namûs gelek kêmtir in, lê me digot qey Uğur Mumcu yekî pak e. Gotineke pêşiyên Kurdan heye, dibêjin: "Heft lawên pîrê hebûn, qencê wan q...k bû". Ez dinêrim Mumcu jî destê me wiha dide ber rûyê me.

Hûn bi qedrê Xwedê kin, li vî aqilê Uğur Mumcu binêrin. Di

22-5-1992'an de, di rojnâmeya Cumhuriyetê de, binêrin çî dibêje: "Efendim! Çawa Amerîka li ser îşxala Kuweytê dixeyîde, lê li ser a Qerebax û Nexçîwanê naxeyîde?!!" Wax wax Uğur Mumcu. Ma lawo, ku tu hê jî

Kuro, ma Amerîka, Rûsya û Ewropa kerê te ne ku Tırkeş bikin Başbûxê Qafqasan û Asya Navîn? Lawo, ez nizanim, bê çîma Xwedê jî me standiye, em bi aqil nabin. Yabo, bila îro eva ku em jê re dibêjin Tırkiye di destên me de bimîne, em maç bikin û li ser serê xwe kin.

bi vê nizanibî, ma ezê ji te re bibêjim çî? Hema qelma xwe nizanim têxe kudera xwe. Birako! Me digot qey tu nivîskarekî jîr î, xefiyê polîsan î, guhê te qul e, haya te ji MIT'ê û temamê îstîxbarata Tirkîyê heye. Ku tu hê jî bi vê nizanibî, îca bû çî?

Lawo! Kuweyt ne dewlet e, benzîxaneyaya Amerîka û Ewropa ye. Xeyda wan, ne ji bo çavên Ereban ê reş e, ji ber malên xwe qebûl nekirin. Ku ne wiha bûna, tu zanî dê Amerîka bigota çî? Weke gotineke pêşiyên Ereban: "Seletelahu kelb ela tenzîr". Yanî, Xwedê teala, kûçik berdaye wehş. Bê henek Serokê Iraqê Sedam Huseyn seyekî har e, lê Kuweyt jî, xenzîreke bi mermûr e.

De îca ka em bêne Qerebax û Nexçîwana te. Kuro, ma Amerîka, Rûsya û Ewropa kerê te ne ku Tırkeş bikin Başbûxê Qafqasan û Asya Navîn? Lawo, ez nizanim, bê çîma Xwedê jî me standiye, em bi aqil nabin. Yabo, bila îro eva ku em jê re dibêjin Tırkiye di destên me de bimîne, em maç bikin û li ser serê xwe kin.

Zirte zirta hikûmeta me, hûn zanin weke çî ye? Di zimanê me de pirseke pêşiyên heye, dibêjin: "Tirrên ber telaqê". Yanî, dema mirovek dikeve ber mirinê, bê hemdê wî ba ji ber dere. Lê car din, li ser vî bayî meseleyeke me Kurdan heye. Dibêjin, zilamekî ketibû ber mirinê, der û dora wî tije bû, lê ba ji ber diçû. Hûn zanin, li cem Kurdan tîr pirr şerm e. Ji ber ku elametê qûnekiyê ye. Lawê wî dibêje: "Hay ji xwe hebe, pirr şerm e". Bav dibêje: "Ma min çî kiriye?" Law dibêje: "Yabo, ba ji ber te diçe, şerm e". Bav dibêje: "Lawo, va ye ez diçim, ma êdî emê kengê li rûyê hev binêrin?"

Ez dinêrim, ev tîrên hikûmeta me, dê bikin ku em û ew cumhûriyetên ku dibêjin em Tirk in, nema karibin li rûyê hev binêrin.

Piştî Beytuşebab û Baseyê (Güçlükonak) ambargo belav dibe

Li Şirnexê ambargo

Navenda Nûçeyan- Ambargoya ku parçeyek ji "tevgera hundirin" û siyaseta tunekirinê ye, piştî Beytuşebabê û Baseyê (Güçlükonak), niha li Şirnex, Dihê (Erûh) û Qilabanê (Uludere) dest pê kir. Ambargo, ji gundan berê xwe da navçe û bajarên ji.

Qilaban ji tene meşandin.


Li gor agahiyên ku me bi telefonê ji Şirnexê girtin, hêzên dewletê destûrê nadin ku gel, ji navçe û bajarên din, ji xwe re qût peyda bikin. Ên ku dikaribin ji rayedarên dewletê wesîqe bistînin, tenê ji bo pêdiviyên xwe yê çend rojan qûtên xwe tinin. Lê dewlet wesîqe nade her kesî.

Ambargoya li ser Baseyê ji, bi hemû dijwariya xwe ve didome. Kurdên li vê navçeyê û gundên wê di sinorê birçîbûnê de ne. Hêzên dewletê bi ambargoyê ji na-

sekinin. Di êrişên xwe yê ser gundan de, hemû qûtên gundiyan talan dikin û dişewitînin. Birçîhiştin û talankirin li gund û navçeyên din ji belav dibe. Dewlet, dixwaze bi vî awayî gelê herêmê koçber bike.

Li ser ambargoyê û êrişên ser gundan, me ditînen Mebûsê HEP'ê yê Şirnexê Selim Sadak girtin. Selim Sadak, van kirinên dewletê mîna qirkirineke girseyî dinirxîne û wiha dibêje: "Tişteki weşarî nemaye. Dewlet bi awayekî eşkere, li herêmê qetliam dimeşîne. Ambargo

ne tenê li 3-4 navçeyan e. Îro li hemû gund, navçe û bajarên herêmê, ambargoyên wiha hene. Yê ku dikaribin ji hêzên dewletê wesîqe bistînin, birçî namînin. Lê dewlet wesîqe dide mirovên xwe bi tenê. Îro li herêmê, tu kes nikare qala mafên insanî bike. Lewre tişteki wilo nîn e. Ez jî, bangî wan kesan dikim ku mafên heywanan diparêzin. Bila werin li Kurdistanê, li halê heywanan binêrin. Lewre hêzên dewletê, mîna li Bana (Ormaniçi) pêk anîn, di êrişên xwe de hemû



Selim Sadak

heywanan dikujin. Tu hêviya me, ji parastina mafên insanî nema. Qet nebe, bila werin heywanan biparêzin."

Li gundên Kurdistanê talan û wehşet

Navenda Nûçeyan- Hêzên dewletê, li gundên Kurdistanê qetliam û talanên xwe her diçe zêdetir û dijwartir dikin. Ber bi Newrozê ve, gund û navçeyên Kurdistanê bi êrişên hêzên dewletê, tene şewitandin û xelkê, mecbûrî koçkirinê dikin. Çapemeniya Tirk, radyo û televizyonên dewletê, gundiyan ku tene kuştin mîna "teroristan" teşhîr dikin. Erzaq û qûtên ku ji gundan tene talankirin, mîna erzaqên ku di stargehên gerîla de hatibine girtin, nişan didin.


Sibatê de, li gundê ku girêdayiyê Basê (Güçlükonak) Şirnexê ye, pêk hat. Cendirmeyên qereqolên Güçlükonak, Findik û Zêwe tevî cerdevanên herêmê, ji çar milan ve, bi ser gundê Bana ve digirin. Hêzên dewletê û cerdevan pêşî gund bi çekên giran dikutin. Di vê gullebaranê de, çend gundi û zarok birindar dibin. Dû re dikevin nava gund û gundiyan tevî jin û zarokên wan bi werisan bi hev ve girê didin û davêjin ser berfê. Di vê navê de, êrişî çend gundiyan ku nehatine girêdan dikin û hemû

zinetên pîrekan bi zorê ji wan distînin. Hin ji leşkeran jî, bi çekên lavî, hemû avahiyên gund dişewitînin. Lê beriya ku ev avahî bêne şewitandin, hemû eşyayên wan ên bi buha û qûtên wan tene talankirin.

Di nav van êrişkarên de, 20-30 kes hene ku rûyên xwe bi maskeyan veşartine û bi Kurdî dipeyivin. Ev kesên han, dest davêjin jin û keçên gundiyan û zinetên wan bi lêdanê talan dikin.

Yek ji wan zarokên ku birindar bûye, bi navê xwe Abîde Ekin, 2 rojan di sikratê de dimîne û ji bê dermani dimire. Ji vê malbatê Halîme Ekin, Mahmut Güler, Ali Erbek, Şehabettin Erbek, Abdullah Ekin û M. Nuri Özkan jî birindar in. Dû re tevî wan birindaran 46 kes bi xwe re dibin.

Di vê êrişê de, hemû seawalên gund jî, tene kuştin. Piştî hêzên dewletê vedikişin, zilamên gund direvin gundên Kereşa, Bafê û Dilopkê. Jin û zarok ti û birçî di şkeftên der û dora gund de, bi cih dibin. Ev bûyer di çapemeniya Tirk, radyo û televizyona dewletê de, weke şerê gerîla û hêzên dewletê hate nîşandan. Di van nûçeyan de, qala leşkerekî kuştî ji



Li alîkî serma zivistanê li aliyê din ambargoyên dewletê...

tê kirin. Li gorî gundiyan, li hember hêzên dewletê yek gulleyek ji nehatiye teqandin. Tişteki wiha dibe ku di nav wan de bûbe û vî leşkerî jî mîna ku di şer de hatibe kuştin nişan dan.

Piştî vê êrişê bi rojekê, vêca firokeyên dewletê tene gund bombe dikin. Gundiyan ku me xwe gihande wan ji me re wiha gotin: "Ger em ax û kevir jî bixwin, ji sermayê hebo-hebo bimîrin jî, tu kes ji me ji gundê xwe dernakeve. Dibe ku em bimirin, lê emê li ber xwe bidin. Bila herkes vê zanibe."

Mebûsê HEP'ê yê Şirnexê Selim Sadak, li ser vê bûyerê beyanekê weşand. Selim Sadak, bi giştî qala bûyerê dika-

û bangî hemû kesan dika ku herin herêmê û rastiye hin bibin.

Êrişên bi vî rengî, li gundên Şirnexê yê din jî didomin. Hêzên dewletê, ji gundê Cînebirê (Yeşilyurtê) 4 kesî bi xwe re birin. Hêzên dewletê, nêzîkî 10 roj berê jî, ji vî gundi 4 kesan girtibûn.

Ali Yîgît: "Ê li Dêrikê hatin kuştin gundi ne."

Mebûsê HEP'ê yê Mêrdînê Ali Yîgît, li ser 6 kesên ku li Dêrikê hatibûne kuştin û di çapemeniyê de mîna gerîla hatibûne nîşandan, beyanekê weşand. Ali Yîgît di beyana xwe de, diyar dika ku ji wan 6 kesan 4 jê, gundi ne û bi îşkence hatine kuştin.

Sedam dixwaze bi Kurdan re rûnê

Serokê Iraqê Sedam Huseyin dixwaze ji nû ve, bi Kurdan re ji bo otonomiyê peymanê çêke. Serokê YNK'ê Celal Telabanî, di daxuyaniya xwe de diyar kir ku, "Sedam Huseyin dixwaze li ser peymana otonomiyê ya ku di 1991'an de nivê mabû bi me re ji nû ve têkeve têkiliyê. Lê em bi Sedam ewle nabin."



Celal Telabanî

Berê jî Kurd û rêvebirên dewleta Iraqê gelek caran li ser otonomiyê li hev rûniştin. Lê tu encam nehat standin.

Li girtîgehêan îşkence û zordarî

Navenda Nûçeyan- Girtiyên Girtîgeha Hezêxê li ser îşkenceyên ku li wan hatine kirin, daxuyaniyek dan.

Li gorî daxuyaniya wan, îşkenceyêk dijwar li Girtîgeha Hezêxê tê kirin.

Berpirsiyarê CHP'ê yê Hezêxê û muxabirê HHA, Faik Kaplan û Serokê SHP'a Hezêxê Hüseyin Demir û 50 kesên din, roja 22'ê Çileyê hatibûn girtin. Hemû di hundir de îşkence û zilmeke dijwar dibin û ji wan tê xwestin ku, li dijî PKK'ê propaganda bikin û bi darê zorê hin belge bi destê wan tên imzekirin. Faik Kaplan, di daxuyaniya xwe de wiha dinivise: "Rojek saet li 8'ê êvarê hatin ez birim. Xwestin ku ez bipeyivim. Dema min xwestina wan neani cih, wan ez vêca tazi kirim û li min dan. Ji bo ku ez li rû kamerayê li dijî PKK'ê propaganda bikim. Îşkence li min kirin, ez avêtin derve, saetek ez li derve îclav (şilfi) tazi li ber sermayeke -20 derece mam. Min disa ji daxwa-

za wan red kir. Vêca sileh danin ser mejiyê min, bi kotek bi min dan gotin.

ÇIMA GEL JI TE HEZ DIKE?

Serokê SHP'a Hezêxê, Hüseyin Demir ji, li ser girtina xwe wiha dibêje: "Ev girtina han komploya Amirê Emniyeta Hezêxê bû. Ji bo girtina me tu delîl di destê wî de tune bû û em nizanin em bi çi tene suçdarkirin. Wan em giş bi kuştinê tehdît kirin. Hin belge danin ber me û bêvi ku em bixwînin bi me dan imzekirin. Îşkenceyên cur be cur li ser me ceribandin. Ji min re digotin, "Çima gel ji te hez dike?" Ez niha ji Wezîrê "Edaletê" dipirsim: Ka li Tirkîyê lêdan û îşkence qedexê bû?

Em di nava ava cemedê de, bi saetan dan rûniştin û elektrik dan organên me.

Çima ku min imzekirina belgeyên wan red kir, du roj bi derengi ez derxistim mehkemê.

Ji ber ku bi kuştinê ez tehdît

kirim, ji mecbûrî dawî min ew imze kirin.

Ez ji Wezîrê Edaletê dixwazim ku, rê li ber van kirinan bigire"

Kesên ku di Girtîgeha Hezêxê de ne û navê wan li ser vê daxuyaniyê heye ev in: Hüseyin Demir, Faik Kaplan, Şükrü Soşin, Mehmet Atça, A. Kerim Aslan, Ali Aslan, Hasan Doğan, İdris Nas, Çetin Abay, Cafer Atliğ, Hasan Uras, İzzettin Yılmaz, Sadun Hamarat, Yusuf Başaran, Handan Babat, Saif Tunç, Ali Erdemci, M. Selim Aslan, A. Halim Özalp, Ahmet Dirî, A. Rahman Dolmuş, Emin Hezer Adibelli.

LI GIRTÎGEHA BATMANÊ ZORDARÎ


Girtiyên siyasî yên Zindana Batmanê, roja 16'ê Sibate li ser zordariya ku li wan tê kirin daxuyaniyek dan çapemeniyê. Daxuyaniya wan bi kurtî wiha ye: "Roja 15'ê Sibate ji bo şunve standina mafên me yên ku ji

destê me standine, me daxwaznameyekê ji 9 maddeyan pêkhatî, da îdareyê. Eyni roj, êvarê saet li dora 6'an 150 leşker û sûbayek ketin qawîşa me, êrişî ser me kirin. Gelek hevalên me birindar bûn, 7 hevalên me ji, birin avêtin tecrîtê. Dora rojê ji, ji ber ku heval derneketin îçtimayê, 3 girtiyên din ji avêtin tecrîtê.

Li ser zor û pesta ku îdareya girtîgehê li girtiyên dike, girtiyên Zindana Batmanê, ji 16'ê meha Sibate ve bi dorveger dest bi greva birçibûnê kirin.

Daxuyaniya wan wiha didome: "Ji ber kirinê îdarê yê derveyî mirovahiyê û mafên ku ji destê me bi darê zorê derxistine me dest bi greva birçibûnê kir."

Piştî êrişên ser girtiyên Zindana Batmanê, 10 girtiyên ku avêtine tecrîtê ev in: Adil Yaşar, Hayrettin Dündar, Sedat Bakir, Fahrettin İnal, Kamuran Kanaş, Şükrü İşlek, Giyasettin Bingöl, Kamuran Cat, M. Can Avcil, İhsan Öztürk.



Dewlet qatîlên Kemal vedişêre

Navenda Nûçeyan- Dewlet li pey berevajikirina kuştina Nûnerê Özgür Gündemê yê Ruhayê Kemal Kiliç e û dixwaze failê wî vesêre.

Weke tê zanin roja 18'ê Sibate Kemal Kiliç li ser rîya gundê xwe, ji aliyê kontrgerîlayan ve pêşiya wî hatibû girtin û li keviya re hatibû kuştin.

Hem berî ku bê kuştin tistên ku Kemal Kiliç ji derdora xwe re anibûn zimên, hem ji piştî kuştina wî delîlên ku ketine dest, diyar dikin ku Kemal Kiliç ji aliyê hezên dewletê ve bi awayekî rûk û pêk hatiye qetilkirin. Li aliyê din, sersariya Waliyê Ruhayê Akbulut a li hember kuştina Kemal Kiliç, bû sebebê reaksiyonan di nav gel û hin derdoran demokratîk de.

Li gorî nûçeyan muxabirê Özgür Gündemê yê Ruhayê Nazim Babaoğlu, se hefte berî kuştina Kemal Kiliç, serokê qereqola cendirmeyan a Uğurlu Aştubay Taner û alikarî wî Oktay (Uzman Cavuş) ji xortên gundê Kuluçê der heqê Kemal Kiliç de, pirsên wek, "Çi kar dike, diçe ku, kengê vedigere û hwd" dikin.

Weke din Kemal Kiliç, berî ku bê kuştin, ji xortekî naskiriyê xwe re dibêje ku ji aliyê Renaultêke Spi ku plaka wê 21 EZ 509 e ve tê taqipkirin û gotinê xwe didomine: "Ewên ku min taqip dikin, MIT in, Van rojên dawî qet ji pey min naqetin."

Li aliyê din piştî ku Kemal Kiliç tê kuştin, bi talipaten polîsan, bav û birayên Kemal Kiliç her roj dibin qereqola cendirmeyan û ji wan dipirsin ka neyaren wan hene an ji keçikên hevalên Kemal hebûn an na. Bi vî awayî dewlet dixwaze qetilkirina Kemal Kiliç bi suçên adî ve girê bide û bala gel ji ser failên wî yê esas dîr bike.

Li ser vê helwesta sersarî durî ya rêvebirên Ruhayê, gelek komeleyên demokratîk û kesên welatparêz bi meşekê tepkiya xwe nîşan dan. Nûnerên Şaxê Komeleya Mafên Mirovan, nûnerên HEP, CHP û ÖZDEP a Ruhayê, Baroya Ruhayê, Odeya Tabiban, Egit-Sen, Çimse-İs, Fek Gıda San û Sendiqaya Belediyê meşayan û xwestin çelengê deynin ber avahiya wali. Lê polîs rîya wan girt û nehişt çelengê deynin.

Li Ruhayê, piştî kuştina Kemal Kiliç, polîs her tim welatparêzan taqib dike û ji pey muxabirên Özgür Gündemê naqete. Bayram Balci, ji aliyê Renaultêke polîsan plaka wê 63 EC 443- ve tê taqipkirin û bi vî rengî dixwazin çave welatparêz û rojnamevanan bitirsînin.

MUXABİRÊ YENÎ ÛLKE DI BIN ÇAV DE

Muxabirê Yeni Ülke Müslüm Yücel, roja 22 yê Sibate li Ruhayê, ji aliyê polîsan Mucedaleya Terorê re ve, hate girtin. Müslüm Yücel bi serwitandina erebeyê Reyisê Belediyaya Ruhayê tê suçdarkirin. Polîs bi awayekî hovane Müslüm Yücel diçin ji mala wî dibin. Mekanekî li mala wî Bülent Duygun ji pe re digirin.

HEP li dijî girtinê biryara têkoşînê stand

Navenda Nûçeyan- HEP, di civina xwe ya Meclisa Partiyê de, qerare parastin û têkoşîna partiyê stand. HEP, di civina xwe de, li ser "tevgera hundirîn", cinayetên "failê meçhûl" û li ser Newrozê ji rawestiyên.

Cigirê Serokê Giştî Hatip Dicle, di 22.02.1993'an de bi civina çapemeniyê biryarên ku di civina Meclisa Partiyê de standibûn ji bo raya giştî diyar kirin.

Mebûsê HEP'ê yê Amedê Hatip Dicle, di daxuyaniya xwe de cih da van nêrînan: "Em bi beşdarbûna serokên

bajêr re, li ser operasyonên ku li "Herêma Rêveberiya Taybetî" bi navê tevgera hundirîn tene kirin rawestiyên û me ev operasyon ji nêzîkî ve vekoland. Me, li ser cinayetên "failê meçhûl" ku hejmara wan digihîje 600'î û di nava wan kesan de lêzîmên mebûsan ji hene, nixandinekê kir. Weke din heta îro 46 endam û rêvebirên me hatine kuştin.

Li ser vê mijarê jî, li ser helwesta partiyê munaqesê hatiye kirin. Li ser qetilkirina rojnamevan û serbestiya çapemeniyê hatiye rawestin, valakirina

gundan, ji nû ve hate rojevê."

Hatip Dicle, li ser girtina partiyê jî, "Me di civinê de biryara mayîna di partiyê de, stand. Hate xuyakirin ku wê parti were parastin û bedelê mayîna di partiyê de, çi siyasî, çi jî, ji aliyê mûeyideyan ve wê bê dayîn."

Mebûsê Amedê Hatip Dicle, di dawîya daxuyaniya xwe de, ev gotin anin zimên: "Girtina partiya me wê bi xwe re encamên (netîceyên) wehim bîne û wê zerar bigihîje aştî û biratiya gelê Kurd û Tirk.



Girtina Partiya me, hem ne li gorî demokrasiyê ye û hem jî, ne li gorî peymanên navneteweyî yên ku imzeyê Tirkîyê li bini heye ye."

Dîsa eynî senaryo: Birevîne û bikuje

Navenda Nûçeyan- Cenazê Serokê ÖZDEP'a Erzînganê ku mehek berê wînda bûbû, li hêla Pulumurê (Dêrsim) hate ditin. Serokê ÖZDEP'a Erzînganê Cemal Akar, nêzîkî mehek berê wînda bûbû û tevî hemû lêgerînan, nehatibû ditin.

Cemal Akar, beriya ku bê revandin, ji malbata xwe re, gotibû ku "Polîs li dû min in." Malbata Cemal Akar û rêvebirên ÖZDEP'ê tevî hemû serlêdanên xwe ji rayedarên dewletê tu encam negirtibûn.

Cendekê Cemal Akar, piş-

tî bi mehekê roja 25'ê Sibate li hêla Pulumurê, di nav berfê de hate ditin. Cendekê Cemal Akar parçe parçe kiribûn. Serê wî, ji gewdeya wî veqetandibûn û milekî wî jî, wînda bû. Malbata Cemal Akar, cendek ji kincên wî teşhîs kirin. Di cendekê Cemal Akar de, derbeyên xedarên îşkenceyê dihate ditin.

Kuştinê bi vî rengî, bi Wedat Aydın re dest pê kiribûn. Dû re bi dehan kes bi eynî metodê hatin kuştin û ev qetliamên kontrayan bi hemû dijiwariya xwe ve didomin.

LI MAZRAYÊ DU WINDA

Li Mazra (Eleziz) yê kontrayan Avûqat Metin Can û Dr. Hasan Kaya revandin. Serokê Komeleya Mafên Mirovan a Mezrayê Avûqat Metin Can û hevalê wî Dr. Hasan Kaya, roja 20'ê Sibate hatin revandin. Piştî wînda bûnê bi rojekê, mirovekî telefonê Mala Metin Can dike û dibêje: "Me herduyan ji kuştîye"

Serokê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan Akin Birdal, li ser van windabûnan beyanekê da çapemeniyê. Akin

Birdal di beyana xwe de wiha dibêje: "Çend roj berê, endamê Rêveberiya KMM ya Ruhayê Kemal Kiliç hate kuştin. Îro jî, Serokê KMM'ya Mazrayê Av. Metin Can û hevalê wî Dr. Hasan Kaya wînda ne. Mirovek telefonê mala Metin Can kiriyê û gotiyê, "Me herduyan kuştîye."

Di van mehên dawî de, tehdîdên li ser komeleya me û endamên wê, cihê xwe dane cinayetên. Divê mesûlê van cinayetên derkevin holê, nexwe dê berpirsiyarê van cinayetên dewlet be."

PÊNÛS



Amed Tigrîs

Xwezî bi nivîskariya Swêdê an bi Tirkbûna Ewrûpayê?

Hejmareke resmî tune ye, lê li gor texmînan li Swêdê 10 hezar Kurd dijîn. Li Almanyayê 300 hezar hene. Bi tenê li bajarê Hamburgê an jî, li bajarê Berlînê 20-30 hezar Kurd dijîn. Em Fransayê li aliyekî bihêlin, li Belçîqa an jî Holandayê 60-70 hezar Kurd hene. Yanî hemû Kurdên li Swêdê, biqasî yê bajarekî van welatên Ewrûpayê tune ne. Pirraniya Kurdên li Swêdê, piştî 1980'yî hatine Swêdê. Yê Almanyayê û yê li welatên din, jî salên 1960'an ve hatine û cihwar bûne. Ka em binêrin di hêla pêşketina ziman, edebiyat û kultura Kurdî de, Kurdên li Swêdê û yê li welatên din ên Ewrûpayê çi kirine. Ji ber ku gelek kes rexne li Kurdên li Swêdê digirin. Bi taybetî di warê nivîs û nivîskariyê de gelek

Rast e, li Swêdê hewesa nivîskariyê gelek e. Qasî ku min tespît kir û ez nas dikim di navbera 10-12 salan de, 150 kes li Swêdê wek nivîskar di kovar û rojnameyên cur be cur de nivîs nivîsine.

ye weşanxane. Ki bizanibe kumik bide ser tîpan dibe nivîskar." Gelo ev rast e?

Rast e, li Swêdê hewesa nivîskariyê gelek e. Qasî ku min tespît kir û ez nas dikim di navbera 10-12 salan de, 150 kes li Swêdê wek nivîskar di kovar û rojnameyên cur be cur de nivîs nivîsine. **Berbang** 12 sal in ku xwerû bi Kurdî derdikeve. **Dîsa Roja Nû, Arman** 6 sal in ku xwerû bi Kurdî derdikevin. Kovara zarokan **Kulîlk û Hêlin** tev bi Kurdî bûn. Kovara **Nûdem** niha li Swêdê çap dibe.

Dîsa Rizgariya Kurdistan, Kurdistan Press, Hêviya Gel, Demokrat, Xebat, Berhem, Bergeh, Rojev, Niştîman, Berxwedan (Berxwedanê li Swêdê dest bi weşanê kir û paşê li Almanyayê berdewam kir) bi Kurdî û Tirkî der çûn. Bi awayekî resmî, jî 10 salan bêhtir e ku, zimanê Kurdî di dibistanên Swêdê de tê xwendin û nivîsandin. Ji bo van dibistanan 20 pirtûkên Kurdî hatine amadekirin. Dibistana mamostetiya vebû û bi qasî 10-15 kes li wir bi zimanê Swêdî re perwerde û hîndekariya zimanê Kurdî jî dîtî. Ev kes îro mamostetiya Kurdî dikin. Hinek weşanxaneyên Kurdî ku heval Dilbixwîn bi wan henek û qerfan dike, heta niha bi qasî 10 pirtûkên zarokan ên dema kreş û destpêka dibistanê jî Swêdî wergerandine Kurdî. Ji wan pirtûkên zarokan, wek Pîppiya Goredirêj û Alfons ku bi kêmasî bi 20 zimanî hatine wergerandin. Ferhengên Swêdî û Kurdî hatine çêkirin. Tercûmaniya Kurdî wek dezgeheke resmî hatiyê qebûl kirin. Bi dehan tercûmanên Kurdî kar dikin.

Herwiha klasîkên Kurdî yê Meleyê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Pertev Begê Hekarî li Swêdê jî tîpên Erebi wergerandine Latîni. Kovara Jin, Kurdistan, Hawar û Roja Nû li Swêdê hatin wergerandin. Berhemên Kurdên li Sovyetê wek yê Qanatê Kurdo, Erebi Şemo, Celîlê Celîl li Swêdê, hatine çapkirin. Ji Soranî wek Îbrahîm Ahmed, Abdulaqîb Yusuf, Dr. K. Mezher Ehmed, Şêrko Bêkes li Swêdê hatine wergerandin û çapkirin. Pûşkîn û Îsmail Beşîkçî jî li Swêdê hatin wergerandin.


Herwiha bi hezar rûpelan, li Swêdê berhemên folklorîk hatine berhev kirin û çapkirin. Roman û çîrokên Kurdî li Swêdê çap bûne. Yê ku Enstîtuya Parisê li ser piyan hiştine dîsa Kurdên li Swêdê ne. Niha li Tirkiyê jî, di rojname û kovarên wek Rojname, Welat, Azadî, Medya Güneşi, Rewşen, Newroz û yê din de giranî û rola Kurdên li Swêdê gelek diyar û zelal e.

Lê, li welatên Ewrûpayê yê din rewş çawa ye? Em dev jî nivîsandina Kurdî berdin, ew bi Kurdî naxwînin. Heta bi Kurdî qise nakin. Hevalê Dilbixwîn çima behsa rewşa wan nake? Ew behsa nivîskariya li Swêdê dike.

Gelî xwendevanên hêja, mirov xweziya xwe bi "weşanxanên malan û nivîskariya bi kumikan a Swêdê" bîne an jî, bi Tirkbûna Kurdên li Almanyayê û yê welatên din bîne baş e? Ka de hûn bibêjin?

Strana li ber conî: Yarê hayê

Yarê hayê	Serê lahê	Gazi dikimê	Sê çar deri	Xwedê nekir	Nav şuşana
Heçî newe	Hezar rengo	Dengê kirin	Tê digeri	Çû kaniyê	Yarê hayê
Dan kutayê	Hezar xwezyo	hewtê	Hema Roma	Wexte bêyo	Navê Gewrê
Bigre tayê	Me lawê hingî	Yarê hayê	Reşit Paşa	Tasik deyne	Bêriyan e
Îşev bigri	Me gul çinin	Ew Erenz e	Ingeçeri	Here pêyo	Deqa l'enyê
Sibê bimri	Bi siradê	Xweş Erenz e	Diyarbekir	Eger neda	Çendî pan e
Şev çile bi	Bi bêjîngê	Ser de bax e	Giya zer bû	Cer bişkêyo	Ew ditine
Erd hilnebi	Me şeyandî	Bin de rez e	Birîna lawkê	Ew qîsmetê	Bi zêran e
Ew tîrbîka	Kêşa Xerza	Ez ku çûme	Min xencer bû	Min û te ji	Ew qalan e
Wi sergo bi	Vê zêvingê	Ba Şêx Eli	Dost hekim bû	Her Xwedêyo	Wê b' kîsana
Ew kefenê	Werne keçka	Goştê kewa	Wa li ser bû	Lo xwedêyo	Lawno wernê
Wi bico bi	Zivingî ne	Da ber gez e	Şev bi şevê	Baran bêyo	Çi talane
Ew meleyê	Werne kurika	Hin xerez e	Roja paşi	Av li konê	Ew talanê
Wi xildo bi	Bamerdî ne	Hin çerez e	Bê mefer bû	Reş bizêyo	Van koçerê
Yarê hayê	Werne berfa	Ew Şêx Eli	Lo lawiko	Vê xirmkê	Dimiyana
Lê lê qizê	Bi kulin e	Goştê kewa	Rabe cikê	Vê teneikê	Yarê hayê
Li min qizê	Şevêk şevê	Da ber geze	Min tu deyne	Rakê pêyo	Lo lo çemo
Te rû reşê	Çilew kanûn	Ez ku çûme	Ez neçûme	A kin têyo	Çemê b' kuncî
Teniya dizê	Çimar çikê	Ba Şêx Bekir	Yarê hayê	Emê binin	Jê firiya
Kanê qewlê	Sing û berê	Ez rûniştîm	Ew Rîdwan e	Wê bejnêyo	Du kevokê
Min û te kir	Gewra xwe me	Falek vekir	Xweş Rîdwan e	Çi bejneka	Stû narincî
Li sika holê	Gewra mina	Falê rast go	Aliyek dest e	Zirav lêyo	Hezar xwezya
Par payizê	Pencenari	Derew nekir	Yek zozan e	Ew zirava	Min bi wi lawî
Paviz hat û	Îro sê roj	Ew ya min bû	Aliyek mey e	Kember lêyo	Keyf û dilkê
Av cemidî	Jajî nani	Xwedê nekir	Yek meyxane	Ew kembera	Xwe zewici
Bihar hat û	Van şeqala	Yarê hayê	Min pirsibû	Kisik lêyo	Yarê hayê
Gul seridî	Van beqala	Kela Zoqê	Ji şivana	Ew kisikê	Xalê te me
Xew li çavê					Xwarziyê min i
Reş herimî					Mamê te me
Lo lo lawiko					Birazyê min i
Rabê m destê					Derbek lêde
Hev bigirin					Here bini
Emê herne					Ew pawana
Nav xanika					Min hemandi
Dera derkê					Te çeqinî
Bi çirik e					Yarê hayê
Kaniya navê					Çû kaniyê
Bi şirrik e					Nizanim ki bû
Yarê hayê					Ew delengê
Lo şivano					Şaşani bû
Pezê babê					Şimik zer e
Te celeb e					Zoqani bû
Hebe hebe					Heta bori
Zêde nebe					Çavê min jî
Dêla xwesyê					Li derzika
Ser sebeb e					Singa wê bû
Lo şivano					Bori çubû
Pozê babê					Taxa jori
Te mêşin e					Heyran dibim
Ew bêriyan					Ji gewra xwe re
Gewra min e					Gewra min a
Destê gewrê					Pencenari
Bi bazin e					Îro sê roj
Te weşand û					Jajî nani
canê min e					Yarê hayê
Sê pa ji kula					Keçê kirasê
Şeva din û					Te xafik e
şeftira din e					Serê memka
Hemî sûcê dêla					Xweya dike
Xweşya min e					Şeva inê
Lo şivano					Roja la'dê
Tu pez berde					Li ser tîrba
Vi çiyayî					Xêra mirya
Hin diçerî					Bela dike
Hin dikalî					Kinê bejna
Qismek erd e					Te qanûn e
Xwedê dayî					Kezi li mila
Lo şivano					Bela bûne
Tu pez berde					Îro sê roj
Vi çiyayî					Ez ne'l mal
Serê nêriya					bûm
Ser berjêrke					Miştîrî li gewra
Dost nexweş e					Min rabûne
Xwedê xer ke					Yarê hayê
Lo koçero					Wê l' bin derge
Pêşî şengo					Wê l' te dabû
Akinciyo					Cotê zerge
Derî tengî					Wê helandin
Lo cotyaro					Nav û cerg e
Ga çelengo					
Dost mîna ye					
Şemamoka					



Mahmud	Birincî ye	Ji gavana	Pere têyo	
Qirdo	Ew miqamê	Navê dosta	Sed piroz be	
Seydo Erdal	Tivinkçî ye	Min Ohana	Li wê bejnêyo	
Hiznek dani	Axa kuştin	Yarê hayê	Ew perekê	
Yarê hayê	Bê bexti ye	Lê lê qizê	Çimhil lêyo	
Ew Bêkendê	Kela Zoqê	Lali lali	Ew çimhilê	
Ne tu tişt e	Nola hêk e	Hewşa Babê	Zerî lêyo	
Modeyiye	Şênî rabe	Xwe dimali	Wê l' ber pišta	
Wa li pişt e	Biska çêke	Gazi dikimê	Wê dostêyo	
Eva keçika	Ez ku mirim	Bi delalî	Min dost dibû	
Mala lawika	Paşiyê çavê	Dengê m'çubû	Wê l' ber conî	
Xera kiriyê	Xwe'l xelkê ke	Taxa wi ali	Ew sê biska	
Bi kaxez û	Dêsta Mûşê	Ji kulê te	Quncê honi	
Bi nivîşt e	Pelek erdê	Ji derdê te	Şeva tari	
Ew Bêkendê	Şênî rabe	Ez ketime	Zelemata	
Şîşa rij e	Biska berde	Ber vi hali	Zalim babê	
Sibê'w êvar	Mêrê xerab	Lê keçikê	Cotê memka	
Serê mij e	Kul û derd e	Hewş dimiştê	Kiryê ronî	
Ez xulama	Jina xerab	Toqa benya	Yarê hayê	
Gewra xwe me	Ne tê kuştin	Kiştê kişt e	Lê lê qizê	
Sitêra sibê	Ne tê berdan	Eva keçka	Lali lali	
Karwankuj e	Cewabek	Mala lawika	Hewşa babê	
Mêr û zêwê		Xera kirye	Xwe dimali	
Çi bilind e		Bi kaxez û	Gazi dikimê	
Kerkelanê		Bi nizûl û	Bi delalî	
Wa li bind e		Bi nivîşt e	Dengê min	
Xalibiyê		Lê keçikê	çubû	
Ji wê wir de		Hewş dimiştê	Taxa wi ali	
Ew Cefanê		Gazi dikimê	Ji kulê te	
Rêza gund e		Bi delalî	Ji derdê te	
Ez ku çûme		Dengê min	Ez ketime	
Vê Entîne		çubû	Ber vi hali	
Kewek firiya		Taxa wi ali	Yarê hayê	
Ser hêlinê		Ji kulê te	Hingi sitêrê	
Bû qiseta		Ji derdê te	Li ezmana	
Min û xelkê		Ez ketime	Hewqa koçer	
Têli delal		Ber vi hali	Çûn zozana	
Bi qiseta		Hiznek dani	Min pirsibû	
Stî û Ferxik		Çû kaniyê	Ji şivana	
Û Mem û		Av li xwe kir	Ji gavana	
Zin e		Eynik dani	Navê dosta	
Ez ku çûme		Tûncik şê kir	Min Ohana	
Hafa Ewtê		Ew ya min bû	Îsal dani	

Berhevkar:
Zakir Gibîştî

Dengbêjê nemir Miradko



Miradko (1946-1985)
Wêne: Ezîz Botanî

Ew di ciwaniya xwe de tê gundê Kerboranê. Ew ji malbata Kinê ye. Ji lew re bi **Miradê Kinê** hatiye naskirin. Di gel ve bi navên **Miradê Ferho** û **Miradko** jî tê nasin. Ew jî malbateke hunerhez e. Ew û keçên wê malbatê hemû folklorvan in û muzîk û helbest bûye pişkek di jina wan de.

Kemançeya wî gelekî nerm, xweş û çûş bû. Şahiya wê bê westan bû. Gelek bandên wî hene. Ne bi tenê Torî û Mêrdîni guhdariya wî dikin û jê hez dikin, her wiha Botan, Hekar û Behdînan jî, jê hez û guhdariya dikin.

Ew jî bo jina xwe gelek digeriya û derdan noş dikir. Salê bi dehan car li Botan û Mêrdînê dibû mêvan û jî xelkê re bi zaravayên wan jî distir. Ji wan, stran hin û fêr dibû. Gelê Suryani jî gelek alî wî dikirin û bi çavêki bilind lê temaşê dikirin. Piştî ku ji-

yan sext bû, li devera Torê pişkek (qismek) mezin ji Kurd û Suryani gundên xwe di cih de hiştin û ber bi Stenbolê ve çûn, hingê rewşa Miradko jî têk çû. Bû sext û giran. Wisa bê dost û bêkes ma.

Dibêjin ku di sala 1984-1985'an de, şofêrên devera Midyadê pevçûn û ketine dadgehê. Ev bû sebeb ku Miradko li ser welêt strî. Polîsan Miradko anîne Zindana Sêrtê. Piştî mehekê martir (şehid) bû. Hingê ew 39 salî bû, ku jî nav me koç bû.

Xwendevanên delal! Bi sedan wekî hunermend Hesen Zîrek, Remezan Cîzîrî, Feyaz Zaxoyî, Erdewan Zaxoyî, Memo Berazî û hwd. Ji ber sitemê wînda bûne. Karekî heja ye ku mirov bi kêmasî be jî, rûpelekê li ser jina wan binivîsîne. Ez niha berhevo-keke biçûk li ser jiyana Miradko yê nemir berhev dikim.

ZIRAVÊ

Wa ziravê, ziravê
Ziravê, ziravê
Ronahiyê li germavê
Ziravê, ziravê
Tama memikên te xweş in
Ziravê, ziravê
Gundor in, hem zebeş in
Ziravê, ziravê

Rihana derê çiyayê
Ziravê, ziravê
Ji ber te digirim taye
Ziravê, ziravê

Bejna te çî xweşik e
Ziravê, ziravê
Kar û barê xwe bike
Ziravê, ziravê

(Kek Dawîd Şîrnexî dibêje ku nemir Miradko strana Ziravê jî bavê min fêrbûye)

KEÇKOKÊ BIMEŞ

Keçokê bimeş, bimeş
Xulamê van keziyên reş
Ramûsanana bide min
Ezê bibêjim sihet xweş
Sihet xweş

Keçkokê ez gune me
Aşiqê bejna te me
Ramûsanana bide min
Sibê ser soza xwe me
Ya xwe me

Te ban dikim xweşkokê
Şîrinê, şemamokê
Ramûsanana bide min
Heya bigihême Zaxoyê
Zaxokê

Jeder
1. Ferman Alpinar 80 salî Kerboran, niha li Swede dijî.
2. Murad Ozer 40 salî Kerboran, li Swede dijî.
3. Skender, 40 salî Midyad, niha li Swede dijî.
4. Sebri Nîs, 40 salî Botan, niha li Swede dijî.
5. Dengê Dawîd Şîrnexî
6. Demîr Dîlo Cîzîrî

Berhevkar: Beşîr Botanî

Du mihrecanên Kurdan: Zêw û Şêhr

J. Dilovan

Di sêkuçeya Midyadê, Kercewsê û Kerboranê de, li çend gundan her sal di dema payizê de mihrecan dihatin gerandin. Çend mihrecanên giring ev in: **Zêwa Hêstreke**, **Zêwa Seyd Bilal** û **Şêhra Haxê**. Ev mihrecan berî niha bi sed salan heta 1980'yan geriyan. Lê mixabin, dagirkeran piştî 1980'yan ev mihrecan qedexekirin.

Ev mihrecan jî bo gelê heremê, bingeha çand û dilana (folklor) Kurdi bûn. Nişê (nesil) ku ev mihrecan ditin jî aliyê wêjeyê devkî ve û jî aliyê stran, dilok hwd ve gelekî pêsketi bûn. Lewre di van mihrecanan de hunermend, tembûrvan, ribabvan, dengbêj û şerbêjên Kurdan li hev dicivîyan. Berhemên wêjeya Kurdi radixistine ber çavan.

Niha ez dixwazim dermafê van mihrecanan de çend çavdêrên xwe binim zîman. Mihrecana **Şêhra Haxê**, di 26'ê Tebaxê de li gundê **Midyadê Haxê** çêdibû. Hax gundekî dîroki ye. Ev mihrecan jî bo salvegera çêkirina Dêrseydê pêk dihat. Ji mêjûya kevin, berî niha bi hezaran salan dest pê kiribû. Lewre çêbûna Dêrseydê di bûyîna Isa de ye. Li Haxê file

(fileh) û çend mal jî, musulman dijîn. Roja Şêhra Haxê li meydana nêzîkî Dêrseydê govend li dar diket. Bi hezaran mirov, xort, qiz beşdar dibûn. Li hêlekê suwariyên Kurd bi hev re hesp berdîdane bazê. Di 1961'an de ez jî beşdarî Şêhrê bûbûm. Me teva suwarî temaşê dikirin. Suwariyekî hespê xwe bi çargavkî berda bazê. Dû re yeko yeko cilê xwe jî xwe kirin. Heta ku derpê kin tenê lê ma. Dû re di sa cilê xwe giş li xwe kirin û pişt re hespê xwe sekinandin. Suwariyekî din jî dibin zîkê (hûrê) hespê zivîrî ser zîn. Suwariyên din jî hunerên xwe bi me dane xuyakirin. Ji Ewropa jî bi sedan mirov beşdarî Şêhrê dibûn.

Zêwa Hêstrokê di 28'ê Tebaxê de li gundê Midyadê Hêstreke çêdibû. Hêstrek saetek jî Haxê dūr e. Bi hezaran gelê Kurd, qiz û xortên bedew beşdar dibûn. Li Bêndera Latî govendeke gelek mezin dihatê girêdan. Reqs û govendên Kurdan ên cur be cur dihatin listin. Sê roja bi vi awayî didomiya. Li hêla benderê re ribabvan û şerbêjan şer û stranên me yê giring digotin. Gelek mirov li dorê wan dihatin hev û jî dil û can guhdari dikirin. Hinek jî wan şer û stranên ku dihatin gotin ev bûn: "Evdîrehmenê Zor, Temir Paşa,

Metran Isa, Şemdin û Hemdin, Elo Şexanî û Fatîma Salîm Axa, Şerê Mala Eliyê Memed û Seyrê, Cembeliyê Mirê Hekariyan, Memo û Zîne, Siyabend û Xecê, Hesenê Alîkî, Hewranê Erebb, Teyar Begê û hwd.

Roja belavbûna zêwê li meydana gund sifreke gelekî mezin dihatê raxistin. Ji du sed malê gund xwarin û tametînk (tametîtik) dihatin

ser sifre. Mirovên beşdarî zêwê bûbûn lê dihatin hev dixwarin.

Zêwa Seyd Bilal jî, li gundê Kercewsê Bêcirman dihatê gerandin. Hersal di 12'ê Îlonê de çêdibû. Bi hezaran mirovên Kurd beşdar dibûn. Ev mihrecan, jî bo hunermend, tembûrvan, dengbêj û şerbêjên Kurdan pîrr giring bû. Lewre tevberhemên wêjeya devkî yê

hezaran salan radixistin ber çavan.

Min û nişê hevsalên min çanda gelê xwe jî van mihrecanan girtiye.

Lê sed mixabin û sed heyf ku iro ev mihrecan betal bûne. Ne ku betal bûne, piştî 1980'yan jî alî dagirkeran ve hatin qedexekirin. Iro li gundê Hêstreke cerdevanên gemarî li ser bingeha wî mihrecana delalî pikolê dikin.

Qasetên bi Kurdî jî nû ve qedexe ne

Qasetên bi Kurdî, li bajarên Kurdistanê, bi fermana waliyan tene qedexekirin. Heta niha zêdeyî 20 qasetî hatine qedexekirin. Li gor fermanên waliyên "Herêma Rêveberiya Taybetî" firotin, guhdarîkirin û zêdekirina qasetên bi Kurdî, yeko yeko qedexe dibin. Qedexekirina qasetan, pêşî li Wanê dest pê kirin, dû re li Mûşê, Erzeromê û dawî jî, li Diyarbekirê biryarên qedexekirinê hatin standin. Li Diyarbekirê, di nav meha Sibatê de, zêdeyî 1000 qasetî hatine berhev kirin. Berhevkirina qasetan didomin.

Xwediyên şirketên qasetan û Navenda Çanda Mezopotamya, vê biryarê bi beyanên xwe protesto kirin. Li ser berhevkirina qasetên bi Kurdî, me ditinên berpirsiyareke Navenda Çanda Mezopotamya girtin. Berpirsiyare NÇM'ê ditinên xwe wiha anî zimên: "Di nav qasetên ku tene berhev kirin de,

3 qasetên me jî hene (Koma Çiya-Rozêrîn, Koma Mezrobotan-Çar Stêrk, Koma Berxwedan-Helbestên Bijartî) Hikûmeta iro û ravedarên Tirk, qala demokrasîyê û "realita Kurd" jî devê xwe dernaxinin. Di hemû beyanên xwe de, dibêjin, "Li ser Kurdî qedexe nîn e." Lê hemû derew in. Dewleta Tirk, ber bi Newrozê ve terora xwe ya li ser gelê Kurd zêde dike. Di operasyonan de, bi hezaran Kurd tene girtin û li wan işkençe dibe. Bi dehan kes tene kuştin. Iro, nasandina "realita Kurdi" bûye îfadeya qetliam û tunekirinê. Qedexekirina qasetan jî, parçeyêke ji siyaseta tunekirinê ye."

Xwediyê şirketên qasetan û Navenda Çanda Mezopotamya, bi beyanên xwe jî guhdarvanên muzîka Kurdi hin daxwazan kirin ku, li hember van qedexeyan serî netewin û li zîman û muzîka xwe xwedî derkevin.

Karê karbidestan, her dem li ser gelê Kurd, pêleyisk zilm û zor e. Çaxê ku gelê Kurd zana û bi bir û bawer dibe, pêleyiskên dijmin ji tene guherandin. Bi fênd û xapên gelek zanayî û fêlên geni erîşî gelê Kurd dikin.

Ev hevpeyvîn, di 1991'an de li Kertwênê pêk hatiye. Têkilê me **Ûsivê Elikê Batê** ye. Di nav gelek bûyeran de bi vi rengî cih girîtiye.

Daxwaza min ku hûn bi vê hevpeyvîna xweş hin bibin. Lew ku doh neynika (mirêk) iro ye. Iro jî neynika sibê ye.

Apê *Ûsiv, ez dixwazim ku li ser bavê te Elikê Batê, hevpeyvînekê bi te re bikim. Pêşî ezê entê te bipîrsim.*

Emrê min... Hûn tarîxa berfa sor zanin? Payizê ez hatîme dinayê û zivistanê, berfa sor hatiye. Gerek e heştê û yek sal be.

Navê eşira we çi ye?

Hevêrka.

Navê bavikê (malbat) we çi ye?

Em mala Osmên in. Hingî mezinê me Haco bû. Haco apê bavê min Elik e. Haco, Hemed, Batê û Xelef her çar birayê hev bûn. Mala Çelebî jî pîşnamê me ne. Çelebî kurê Smayil e û Serhan jî kurê Saroxên e.

Eşîrên ku danîstaudîna we bi hev re kîjan bûn?

Em axayê Hevêrka ne. Em li Mizizexê diman. Elikan Mala Cîmo û Silwê Hîto ne. Ew li Hêştrekê bûn. Dekşûrî li Kercewê ne. Axayê wan mala Hesên Şemdin bûn. Hê ji ber de em û Dekşûrî berberê hev in. Em tim bend û holê li hev dikin. Wekî din, Dermemîka mezinên wan Mala Smayil in, Zaxurani, Dorikan, Salihan, Domanan, Basaqî, Hesîne û Botikan... Têkiliya me û van eşîran bi hev re ye.

Eşîra we û Dekşûrî çima ji hev re bûne dijmin?

Mala Ehmedê Ûsiv li Silha ne. Ew jî, ji Eşîra Dekşûrîya ne. Rabûn serdesti li eşîra me kirin. Hatin ketin Tilminarê, Filê, Zêra, Tilqûbe û dest li ser milken wan danin. Ji aliyê din ve jî, destê xwe avêtin Çumera û neheqî li kirivê me Xelef Axayê Eznawirê kirin. Ew jî şiyandine ji Haco re. Gotin, "Em gîş di tifaqa te de û hevalbendê te ne. Van Dekşûriyan em talan kirin. Haya te bi me nîn e."

Haco jî Mizizexê kete rê û li nav Elikan, Dermemikan, Zaxuranyan, Dorikan, Salihan, Hesîne, Domanan, Basaqyan û Botikyan geriya. Du hezar zîlam bi xwe re kar kir. Bi dahol û bi zirne bi rê ket. Hate ser Eznawirê. Erîşî Mala Ehmedê Ûsiv kirin. Heqî yên ku baz dan xwe xilas kirin. Ewên din tevde kuştin.

Ji ber vê yekê fermana Haco rabû. Xulamê xwe Qasimê Yezidî bi xwe re bir û baz da çiyayê Mava. Eskerên Tirkan Cîmo bertil kirin û gotin: "Me divê tu bi me re weri ser Haco. Rabûn Cîmo bi xwe re kar kirin. Cilê Zeyneba jîna Haco li zilamekî kirin û ew jî bi xwe re birin. Haco û Qasim di şkeftê de ne."

Zilamekî bang kir got: "Wa Haco. Ma ji namûsê pê de? Va jîna te di nav esker de ye." Haco li



Qasim vedigere dibêje: "Te deng kir newlo?" Der dikeve şkeftê. Dinêre ku pîrekek bi çekê jîna wî û di nav esker de ye. Ji şkeftê rast ber bi wan ve çû. Çilo nêzîkî li wan kir, tiving berdanê û dane erdê. Cîmo xencera xwe kişand û çû ser laşê wî. Xencer da qirka wî ku bigurîne, Haco got: "Kurê Hacıra Kor, mêr ne ji pêş ve tene gurandin. Ji pişt ve tene gurandin." Cîmo serê wî jê kir û bixwe re birin teslimî hikûmetê kirin.

Di vi çaxî de mezinê eşîrê kî ye û bavê te Elik çi kari dike?

Mezinê eşîrê Çelebî bû. Bavê min Elik şivan e. Li ber pezê xwe ye. Eşîr bi dev Çelebî û Serhan ve hatiye berdan.

Mesudko mezinê filehê Mizizexê ye. Çelebî tadayî û neheqiyê lê dike. Mesudko rabû çû cem Fesla diya bavê min. Got: "Fesla ka Elik bide min." Got: "Tê çi ji Elik bikî? Got: "Ka tu bide min. Kesê ku cêran çêke, wê çembil ji pê veke." Mesudko heft çerxî dane yekî ji Xerabiya. Kire şivan û li ber pez hişt. Elik bi xwe re anî Mizizexê. Bi alikariya filehan qesrek jê re li ser xaniyê Batê tê çêkirin.

Ji bo aboriya Elik, Mesudko çar ker hazir kirin. Dane pêşîya Fesla û Elik. Got: "De herine Kînikê cem filehan. Silavê min li wan bikin. Bila çar çilik ce bi we din." Bavê min û bapira min çûne Kînikê. Filehan tiştêk nedanê. Bavê min û bapira min li piyê paş vegeyriyan. Bi rê de gihane garana Kînikê. Elik rabû çar ga dane ber xwe û birin. Gavên li gund kire hawar. Gundî tev lê derketin. Çaxê nezîkî lê kirin, berê tivingê li wan rast kir û teqand. Baminmîni li dengê tivingê derketin. Qederê şêst-heftê zîlam hatin. Mêzandin ku Elik û Fesla ne Ebûzetê Baminmîni got: "Çi ye? Çi qewimîye?" Fesla got: "Em hewceyî van kûçikên filehan û çar çilik ce bûn û nedane me. Elik ji çar gayê wan birin. Ji ber vê yekê hatine me." Ebûzetê kete neqeba wan û bi cîrm çar çilik genim, barek çiltûk, barek nîsk, barek pîvaz û sêsed kilo tîtûn ji filehan standin û bi Elik re anin Qesra Mizizexê.

Piştî vê yekê eşîr û Çelebî gav ji Elik çinin. Sawa wî kete dilê tevan. Elik dest bi neheqîyan kir. Pîşî bi

xelkê kir. Apê wî Hemed bakirî yê: "Birazi tu tifaqa me û Mala Osmên xira dikî. Min navê ku tu van fêl û finasan bikî." Elik rabû ji Mizizexê çû nav Elikan li nav Omeriya ye. Bi eslê xwe Hevêrki ne. Elik li wir jî rihet nasekine. Dest bi dizîya Mihelmiya û Omeriya dike. Bi dor wan û pişikên dikeve.

Hacoyê kurê Haco vê demê çi kari dike?

Haco, sêzdeh-çardeh salî bû. Pêrûza keça Serhên revandibû. Ew heft salê wî ku xwe li Cîmo

Piştî kuştina Cîmo û qenc û qenc deng bi Elik ket. Di vê demê de dişa hikûmet xurt bû. Çelebî û Serhên dişa bi dor Elik û Haco ketin. Fêl û hîle bi wan kirin.

girtîye. Cîmo ew kiriye Qesra Haxê. Qedr û qîmet pê didê. Kiriyê mezînek ji eşîra xwe.

Serhan sonda asê xwariye. Gotîye: "Ku Haco û ew werîne eşîrê, sê talaqên min ji min çuyîne. Ez li nav eşîrê nasekinim. Ezê biçim Şingalê."

Elik ji nav Omeriyan xwe kar kir. Got: "Ev heft salê Haco ku li Qesra Haxê. Ma efiya wî nayê?" Hat û mesele ji apê xwe Hemed re vekir. Hemed got: "Heyra tifaqa me wê xira bibe. Elik got: "Ev erd digihê vi ezmanî, ez hew disekinim." Kirin nekirin, reda Elik nebirin. Rabûn qederê sed zilamî dane dora xwe û hatin mala Çelebî. Mesele ji Çelebî re jî vekirin. Çelebî got: "Heq e... Lê Serhan jî sonda asê xwariye." Elik got: "Heke tu rast dibêji, bişîne dî Haco û Pêrûza. Wan bine mala xwe. Emê xwe bavêjin Serhên. Heke efû kirin, kirin. Heke efû nekirin, emê ji dêla wî ve biçin Şingalê."

Çelebî çend zilamên xwe kar kirin şiyandin. Haco û Pêrûza anin. Avêtine Serhên. Hatin efûkirin. Haco li dewsa bavê wî kirin

Bi Ûsivê Batê re li ser dîroka eşîrên Kurdistanê

Hevpeyvîn: Jîr Dilovan

mezin.

Piştî Haco bû mezin û sawa Elik jî di nav eşîrê de çêbûye, Çelebî û Serhên dest bi wan û finasan kirin. Hin bi hin hevalên wan jî dora wan dane alîkî.

Dostê Elik çûn mala Elik ji Mizizexê anin Dêra Çomera. Li Kîwexê mala Mêşo hene. Rihê wan bi Haco ve ye. Gelekî hez jê dikin. Serhan hêncet li wan kir. Rojekê xeber ji Dudo yê Mêşo re dan. Dudo xwe çend kire Serhên û beristiyê. Serhan hate Qesra Badibê û li ber Hacoyê zavayê xwe giri. Got: "Cil di bin me de neman. Heta yên weke Dudo diberizîne me."

Haco rabû, beri ku xebera Elik jê çêbibe, bakirê Dorika, Saliha û Domanan. Hatine serê mala Mêşo. Hemû dî dan. Nefsek jî wan nehiştin. Tev kuştin.

Çelebî destê xwe da destê Dekşûriyan. Xwe ber bi hikûmetê ve qedîma. Dest bi me û gili kirin. Eşîr kete neqeba wan li hev anin. Cîmo ji Hêştrekê xwini bû. Çû Altûxwerê. Heft salan li wir xwini ma. Apê min Hemed ketiye Hêştrekê. Piştî heft salan Dekşûriyan rabûn çûn Cîmo anîne Hêştrekê û Hemed kirin der.

Di vê demê de Elik li ku ye? Çi kari dike?

Elik hate Kertwênê. Erd jî xwe re kirî. Çomerya û Saroxanê kurê Serhên got: "Em qebûl nakin ku Elik li vir bimîne." Mezinê wan deran Şêxê Taya bû. Çûne cem wî gili li Elik kirin. Şêxê Taya got: "Elik gurê çiyê ye. Ez ji ku karime bi Elik?" Rabûn çûne Mêrdînê. Tiştêk ji wir jî fêhm nekirin. Çûne Diyarbekirê. Qismek ji Liciyan bi esker re kar kirin û şiyandine ser Kertwênê. Haco û Hiseynê Ferho jî hatin alikariya Elik. Şerek gelek mezin li dora Kertwênê çêbû. Gelek ji esker û ji Liciyan û gelek ji, ji eskerê Elik hatine kuştin. Ji ber vê yekê jî aliyê hikûmetê fermana Elik rabû. Elik baz da. Xwe li çiyayê Mava girt. Çelebîkê Xelef tenê pê re ye.

Cîmo, Axayê Elik ye. Li Hêştrekê rûniştî ye. Hax gundikên Zaxûran, Baqisyan, Zaz, Dêrik û Xerabêqesrê di bin hikûmê wî de ne. Zêlî, Êsê, Êrdê û ew Sedor jî deman kirine.


Cîmo kurê xwe Meçid daye ber

xwe li hespê xwe siwar e û hatiye van gundê ku deman kirine. Êsî û Zêlî xeberê digihînin Elik li çiyayê Mava. Dibêjin, "Tu firseteke weke vê nabîni. Cîmo li filan gundi ye." Elik lê dixê tê Zêliyê. Ji wir jî tene neqaba Zazê, Bahwarê û Dêrikfan. Li Çalka Îsê dikeve pêşîya Cîmo. Tivingê li ser Cîmo datîne. Tiving li ranê wî û li hespê dikeve. Kurê Cîmo jî dikujê. Cîmo hê birindar e. Bang dike dibêje: "Birazi, xwezi min zaniba bê tu kî yî?" Elik got: "Ez biraziye Berên im." Cîmo got: "Birazi heqê te ye." Elik guhê wî ku xeleka zivî tene jê kir û bi xwe re bir.

Piştî kuştina Cîmo û qenc û qenc deng bi Elik ket. Di vê demê de dişa hikûmet xurt bû. Çelebî û Serhên dişa bi dor Elik û Haco ketin. Fêl û hîle bi wan kirin. Ji ber ku hikûmet xurt bû, dest bi axayan kir. Tev girtin. Ji Midyadê Ezizê Memed, ji Çêlik ji Eliyê Remo girtin û ew kuştin. Ji me Mala Osmên, Haco, Elik, Xelilê birayê Elik, Çelebî û Serhan girtin. Hikûmetê qerara kuştina wan kir. Lê Ûris jî rojhilat ve li Tirkîyê xist. Şerekî mezin kete rojhilat. Ûris hate heta bi Kevirê Qûl, nezîkê Sêrtê. Hikûmeta Tirkî kete derdê xwe. Dev ji kuştina axayan berda. Qismê ku ji me girtin kirin hepsa Diyarbekirê. Şemûnê Hemê Heydo Xalê Elik û Hiseynê Ferho jî girti ne. Elik karê xwe û bazdanê kir. Çelebî gili lê kir. Got: "Elik, Şemûn û Hiseynê Ferho wê baz din." Esker şelîtek di bin cihê Elik de girtin. Rabûn hersêkan şiyandin Hepsa Xerpêçê.

Di vê demê de li nav Ûris şores çêbû. Ûris ku ketibû sinorê Tirkî, Îranê, bi carekê çek û silahên xwe bi cih de hiştin. Vegeriyan erdê xwe. Ji Kurdistanê Îranê Simko, dest li ser wan silahên danî. Sêsed hezar eskerê Kurd kire çekdar û li hemberî Îranê serî hilda. Şah bakirê Ûris got: "Va Kurd di sinorê min û te de bûne dewlet. Ji me tevan ve xerab e." Bi alikariya Ûris re da Simko birin û xwina Kurdan careke din hate rijandin. Weke niha tene bira min, dengbêjek hebû. Navê wî Seîd bû. Avête ser Simko. Digot: "Heyfa min tene wê hevfê, ordiya bavê Kêfxusran li deşta Dilemanê ji hev bela bû."

Wê bidome

D
I
L
S
O
Z

Ji ber nameyekê hate girtin

Helbestvan Dilsoz, ji ber nameyekê, ji hêla istixbarata leşkerî ya Sûri ve hat girtin. Helbestvan Dilsoz, di hefteya pêşin a meha Sibata de, li Helebê hat girtin. Sedema girtina helbestvan Dilsoz, nameya ku ji Serokê Amerika Bill Clinton re şiyandiye, ye. Name ji posteya Helebê ya Sûri dikeve destê istixbarata leşkerî. Li ser bidestketina nameyê helbestvan Dilsoz tê girtin. Name li ser sozdayinên Bill Clinton hatiye amadekirin. Beriya ku Bill Clinton hilibijêrinê kar bike, soz dide ku wê mafên mirovan biparêze, li her deverên dinyayê. Her wiha li ser mafê gelê Kurd jî hin sozan dide. Helbestvan Dilsoz jî, di nameya xwe de sozdayî nên Serokê Amerika Bill Clinton, bi bira wi dixê û rewşa her çar aliyên Kurdistanê jê re di nameya xwe de tine zimên.


Jê, bicihanîna sozê ku beriya hilibijêrinê dabû, dixwaze. Wekî din Dilsoz, li ser rewşa Kurdistanê ya kambax, ji Serokkomarê Fransa François Mitterrand û Serokwezîrê Îngilistan John Major re jî, name şandiye û bala wan kişandiye ser rewşa neteweya Kurdî. Helbestvan Dilsoz, ji başûrê rojavayê Kurdistanê (Sûri) Kobanê ye. Heta niha helbestên wî di gelek weşanên bi Kurdî de derketine. Çi li hundirê welêt û çi ji li derveyê welêt. Dilsoz zewicandî û bavê sê zarokan e. Ji aliyê din ve Dilsoz Unîversîteya Helebê, beşa muhendîsiya elektrîkê qedandiye. Helbestvan bi helbestên xwe yê netewekarî tê naskirin. Em jî di vê hejmarê de helbestek ku Dilsoz jî me re şandibû, diweşînin. (Ji *dîwana Destana Şehîdan*)

Rêçenasê Kurdistanê

Nemirê rêca bi rûmet: Mûsa Anter namirî....!
Tu ji şeva Kurdan re xweş. ew find û mûm û agir î
Rêçenasê dûr dibînî. te bi pênûskê vekir.
Rêl û şopên miletê xwe. lew jî herdem perwer î.
Pêncî sal borîn ku xama te ya bê tirs- wê nivîst.
Kurdistan a gelê Kurd e. loma tew jê nagerî.
Qey neyarên me. nebûna tîr ji xwîna me ya pak.
Ta ku govdê kal qelaştin bi gulleyên berberî....!
Ey şehîdê zanebûnê: serxwebûn doza te bû.
Te dixwest ku. wê bibînî ber ku tu bar kî û herî.
Ez dibêm: Tew jî tu namrî. tim di dil de jîn didî.
Tim di mêjî de dimînî. tim ji bo me serwer î
Ey nivîskarê mezin: qet reşbelek nabin ji bîr.
Xweş hozanê Kurd tu yî. tu ji bo me bîr û bawer î.
Ger gelawêj ji ezmanê toreya Kurd hate xwar.
Rast e îstêrkî lê hîn jî. ji wê tu pirr bilindtir î.

Mûsayê wan Ibriyan ew bûye pêxember ji wan.
Lew jî destûrê dixwazin, tu ji me pêxember î.
Tu bûyî yê ku digot axî û ofên Kurd her roj.
Tu bûyî yê ku bi xama xwe nîşan da pirr girî.
Kurd dibêjin: Her bijî biranîna te ey şehîd.
Keç û xortên te dibêjin: Sed hezar car aferî.
Xwîna te hanê şêrîn bê heyf tu caran namîne.
Doza te doza me ye. wê her biçê dawî û serî.
Va gerîla wek pilingan hatne ser dijmin bi hêz.
Leşkerê Apo ye. îro tev ji bin de raperî.
Sond dixwe. nama ji bo wî ku şehîdan hîştîye.
Wê bighê ger laş bi kom bin. qandê çiyayê Agirî.
Rêheval Mûsa tu çuyî: em li pey te va ye tî.
Em in hevçaxên rêya te. tu ji bo me rêber î.
Lew dibêm: Ger xama destên pîr îro jê neyê deng.
Xama Dilsoz î ku tim tu divê di vê rê de herî.

AZADÎ



Abdurrahman Durre

Evren û Demîrel

Ê vara 31.1.1993 an, li Almanyaya bajarê Koln'ê, min guhdariya Radyoya Koln'ê beşa Tirkî dikir. Radyo hewadîsên TC'ê digotin. Evren Paşa, bi wî hiş û mentiqê xwe yê tevlihev û çirto vîrto ferman dikir: "Şerîet, ji komunîstiyê bi talûketir e". Yanî, qanûnê şerîet û Quranê, ji ya komunîstiyê xerabtir û bi tîstir e. Demîrel jî digot: "Navê munafiq û qatilan kifş bûne. Dê di nêzik de navên wan werin eşkerekirin".

Be rastî dema me van herdu xeberan, ji van herdu pîsoran(!) bihîst, me li çavên hev mêze kir û em kenîn. Mala ku em lê mêvan bûn, yekî Alman jî li wê bû; got: "Hun bi çi dikenin?" Me jê re îzah kir, ew jî me pîrtir kenî û wiha got: "Ev Kenan Evren çi dibêje? Dema serokê komara TC'ê bû, dijminê komunîst û çepan bû, alî-

kariya paşve-rûyan dikir, qira zana û rewşenbîran anî. Niha jî dibêje 'şerîetperest ji komunîstan diwartir û xerabtir in', gelo wî hişê xwe winda kiriye? Çi pê hatiye?" Her yekî tişteki got, min jî gotina xwe wiha domand: "Paşa mirovekî bê hiş e. Herwekî hemû hevalên xwe yê faşîst û kemalîst, mêjiyê wî cilq bûye. Ew bi tişteki nizanin. Ne bi şerîetê, ne bi komunîzmê û ne jî bi tişteki din. Çi tê devê wan, wî dibêjin. Weke robotan in. Ji faşîzm û hovîtiyê pêştir bi tu tiştî nizanin û fêm nakin"

Li ser van gotinên min, yê Alman kenî û serê xwe hejand. Yek ji hevalan pîrsek kir: "Meqseda Demîrel çi ye? Ji kî re dibêje munafiq?" Min bersiva wî da: "Divê beriya her tiştî em bizanibin ku, munafiqî çi ye û jî kê re tê gotin? Munafiq gotineke bi Erebi ye. Di Quranê de derbas dibe. Bi maneya "durû", "devmusulman û dilgawir" tê bikaranîn. Li gor hukmên Quranê, kî ku, ji bilî qanûnê Quranê û dîne îslamê bi çi qanûnî hukim û kar bike, kafir e. Kesê ku bi hukim û qanûnê Quranê kar neke û bibêje "Ez musulman im", ew jî munafiq û fasiq e.

Li gorî vê terîf û hukmê Quranê, Demîrel jî xwe re dibêje "munafiq". Lewre, Demîrel û hikûmeta Demîrel, hem bi hukim û hem jî bi hukmê qanûnê Quranê kar nakin, naemilin û hem jî dibêjin, "Em musulman in". Ev yek jî, munafiqî bi xwe ye".

Li ser van gotinên me, yê Alman gelek kenî û meclîs û sohbeta me geş û xweş bû. Yê Alman got: "Jixwe em jî, ji Demîrel re dibêjin "Dopelmoral" û "Hinterhölftig". Yanî, qurnaz, durû û hîlekar. Min jê re got: "Em gelek spasdarê te ne ku em ji te navên Demîrel ên bi Almanî jî hîn bûn. Tu dikarî ji kerema xwe re, ji me re bibêjî ku Alman ji yê mîna Evren re çi dibêjin?" Kenî û got: "Blöde û Brutal" Min jî nû ve spasiyên xwe jê re got û şeva me bi vî rengî derbas bû. Hêvîdar im ku xwendevanên hêja, nav û nîşanên Demîrel û Kenan Paşa yê alafranga ji bîr nekin. "Dopelmoral" û "Blöde".

Ez bi Kurdî dipeyîvim û dinivîsim lê hûn?..

Aysel Can

Rojekê bi tesadûfî riya min bi rojnameya Welat ket. Di nav xebatkarên de, çend kesên nas û çend kesên nenas hebûn. Em hinek peyivîn. Yekî jî min pirsî. "Hûn zimanê Welat çawa dibînin? Hin xwendevan jî me gazinan giran e." Min bersiva heval da û min got. "Na, ne giran e. Ez dixwînim û jî tevîn jî fêm dikim."

Lê gotina heval rast bû. Ez bi kê re bipeyivîma digotin, "Zimanê rojnameya Welat giran e." Ji nav hevalên ku ez nas dikirim yekî got: "Ev heval ne Kurd e. Kurmançî hîn bûye." Hevalê ku jî min pirs pirsibû jî xwe re hevirî. Bawer nedikir ku ez pişt re hîni zimanê Kurmançî bûme.

Min rewşa xwe jî wan re got.

Çawa ku ez hîni zimanê Kurmançî bûme. Ez deh pazdeh sal di nav Kurdan de mabûm.

Min jî heval re got, "Heval ez ne Kurmançî im, lê devê min nagere ku ez bibêjim ez Tirk im. Lê ez nikarim eslê xwe jî inkar bikim."

Niha dixwazim biranîneke xwe binivîsim. Ev biranîna min gîredayî serpehatiya min a jorê ye.

HEP (Partiya Keda Gel) hê nû ava bûbû. Di roja 8'ê Adarê de civînek çekiribûn. Sala 1990 bû. Ev roj, roja jinên dinyayê bû.

Berpirsiyarê civînê jî çend kes jê pîrek bûn. Em çûn cem wan. Me jî wan re got: "Em dixwazîn bi çend peyvan behsa jinê Kurdistanê bikin. Pîrekên Kurdistanê îro di nav şer de ne. Hem jî pîr zilmê dikîşînin. Gerek em îro derdên wan binin ziman". Ji pî-

rekan hin kes pîr qehirin. Hin kes jî deng nekirin. Hinan jî, "Divê em jî filan û bêvan re bibêjin. Hûn jî herin jî filan kes bêvan kes izin bixwazîn belkî bibê." Lê me armanca wan derxist meydanê. Nedixwestin em bi Kurmançî bipeyivîn. Lê di fikra me de peyvîna bi Kurmançî tune bû. Me dixwest bi tenê rewşa pîrekên Kurd bianiya ziman hew. Ew roj jî, pîrekek di nav şer de şehîd ketibû. Niha mixabin ku navê wê nayê bira min. Lewre xwîna jina Kurd jî tê rijandin.

Vêca got: "Hûn nikarin bi Kurmançî bipeyivîn." Me jî got: "Wisa ne wisa, emê bi Kurmançî bipeyivîn." Ban kirin em çûn cem mikrofonê. Min bi Kurmançî dest pê kir. Yek hat cem min got: "Ka mikrofônê" Min got: "Çima?" Got: "An bi Tirki bibêje an jî tercuman bine." Ez seki-

nim ez kê binim. Ji bo peyvên min bizivîrine Tirki. Min nêri yeka Kurmançî tiliya xwe bilind kirîye. Min banî wê kir. Bi vê rewşa me daxwaziyên xwe anî cih. Salon tiji bû. Ji me re li çepikan didan.

Wext derbas bû. Ez jî cihê xwe rabûm, dikim derkevim derve. Li dora min civiyên. Hinekên kêfxweşî di min didan. Ez pîroz dikirim. Yek jî hate cem min. Li min nêri. Min jî lê nêri. Hema mabû ku tif bîke rûyê min. Pîrek tif nekir lê weke bombeya Amerîkî li ser rûyê min teqîya. Digot: "Hûn her gavê li gor kêfa dilê xwe dimeşî. Çima hûn li her derê di cihê xwe de nasekinin? Çima we bi zorê bi Kurmançî şor kir (peyivîn)? Hûn çî dixwazî jî me? Welatê Tirkan dikin du parçe, ne bes e, li Stenbolê jî nasekinin?" Wek van tiştan pîr

tişt got.

Digot: "Ez jî laz im. Ez rabim bi lazi bipeyivim? Wisa çêdibe?"

Ez dikirama mîna bombeya Vietnamî bîteqiyama. Lewre ew ne bê hiş, bê xwendin û cahil bû. Xwedêgiravî, xwendevan, ronakbir û nivîskarê Tirk bû (!). Hê jî dilê min jî wek kesên mîna vê pîrekê tije ye.

Dilê min pîr tije ye. Ez nikarim hemûyan derxim der. Da ku jî rojnameya Welat re binivîsim. Ez jî neteweya Kurd tişteke dixwazim. Çiqas zor be, giran be, bi zimanê xwe biştexilin (bipeyivîn), binivîsin û bixwînin. Netewekariya mezin ev e.

Pîr kes debêjin: "Tu Tirki û bi Kurmançî dipeyivî. Em Kurmançî in lê em nikarin dev jî Tirki berdin."

Kesî di dinyayê de tişteki wisa diye gelo?

Çavkaniyeke hêja

Kaya Müştakhan

Rojnameya Welat gihişt hejmara 54 an. Ev rekorek e.

Di jiyana weşaniya Kurdi de, tu weşanê xwerû bi Kurdi li ser hev 52 hejmar, 53 hejmar, 54 hejmar nehatiye domandin.

Hawar, Ronahi, Roja Nû, Jin, Kurdistan, D. Komkar, Berbang, Berhem, Bergeh, Azadi, Nûdem di qada çanda Kurdi de, xebatên hêja pêk tinin; roleki mezin û heri giring listin û hin jî dilizin. Lê weke rojnameya Welat 52 hefte ku (bê rawestandî) ne hatine domandin. Di mercên siyasi, mercên ku Welat tê de diji de, pesta

dewletê, êrişên kemalistan, rêbiri, mirovkuji û bi hezar fin û fonekên rengin ve, Welat weşana xwe domandiye; ji kozîk û çeperên şoreşgerî dernekitiye. Singa xwe jî hezar êrişên bêbav û bêgav re, kirîye ala azadi û serxwebûnê.

Gava em li ser hejmarên Welat hûr dibin, nivîsarên nivîskarên Welat dixwînin, baweriya me ew e ku Welat gencineyêke pîr dewlemend e.

Musa Anter û Hüseyn Deniz şehîdê Welat in. Nivîskarên Welat, stûna Kek Musa Anter vala nehîştin û heta îro jî "Tir" ên xwe diavêje dijîminê welat! Di 52 hejmarên Welat de, 42 nivî-

sarên Anter; 38 nivîsar jî li ser Anter hatiye weşandin.

Ferhengoka Welat gihişt 1430 peyvan. Stûna "Rewş", "Azadi", "Pênûs" û ya "Hawar" ê didome. A. Keskin (52 nivîsar), A. Tigris (60), A. Durre (52 nivîsar), Dilbixwin (46 nivîsar), Yaşar Kaya (48 nivîsar), H. Deniz (31 nivîsar), Mamo Cûmi (24 nivîsar) û nivîskarên nêzîki bist nivîsar nivîsandine ev in: Yekta Welat, J. Eşpar, Beşir Botani, R. Cizre, Şerefxan Ciziri, Gavan Koçer, M. Kurdi, Ş. Arjen, Zina Şikaki, Nijad Yaruk, Zana Farqîni, Rûken Baxdû û Kaya Müştakhan.

Welat di 52 hejmarên xwe de 1. Di rûpela "Gerdûn û Tirki-

ye" de (216 nivîsar),

2. Di rûpela "Jina civaki û Serbest" de (136 nivîsar),

3. Di rûpela "Çand û Pişe" de (60 nivîsar),

4. Di rûpela "ziman û weje" de (63 nivîsar),

5. Di rûpela "Dirok" e de (57 nivîsar),

6. Di rûpela "Berhemên Rewşenbiri" de (26 nivîsar)

7. Di rûpela "Hozan û Helbest" de (45 nivîsar)

8. Di "Rojeva Welat" de (61 nivîsar),

9. Di rûpela "Bexçeyê Zarkan" de (92 nivîsar),

10. Di rûpela "Jin" de (32 nivîsar) hatine weşandin,

Di 52 hejmarên Welat de (64) hevpeyvîn hatine çekirin; (46) pirtûk hatine danasin û (52) "Gotinên nasberan", hatine nivîsandin.

Ziman û rastnivîsandina Welat bi me ne giran e. Sivik e, zelal e. Divê hin jî zelaltir û siviktir bibê. Divê giraniyê bide peyvê zaravaya Kurmançî; lê divê cih jî bide nivîsarên zaravayên Zazaki û Sorani.

Welatperwer û şoreşgerên Kurd, divê xwedî li Welat derkevin. Pesta dewletê li ser Welat didome. Şirketa belavkirinê, Welat belav nake. Divê em xwe bidin ber barê Welat. Lewre Welat, Welatê me ye. Hebûna me ye, jiyana me ye. Heysiyyet û namûsa me ye, xwedî li xwe, li heysiyyeta xwe, li namûsa xwe derkevin!

Bê ziman, bê edebiyat, bê çand û huner, bê erd, bê al, bê Welat mirov noker e xulam e. Ji rizgari û serxwebûna welat şirintir û bi rûmettir tişteke nîn e!

Nivîskar, xebatkar, xwendevan û alîkarên Welat pîrozbahi dikim. Her bijî Welat!


XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zîlanî

Çeperast: 1-Serokê Serhildana Sasonê. Di wêneyê de tê ditin/ Di Yewnana qedim de, navê ilaheyek 2-Dewamkirin/ Tebeqeyek esmên 3-Vexwarineke bi alkol/ Sembola Kurçatovyümê/ Yanî 4-Birdozi, raman 5-Navê rojekê/ Tembêli/ Notayek 6-Sing 7-Yê ku jî xizmetekê an jî, jî weşanekê bi rek û pêk îstifade dike û weşan li ser navê wan tene şandin/ Sembola Amerikvyümê 8-Giştî 9-Serokkomarê Rûsyayê 10-Li İtalyayê navê volkanekê/ Bi zimanê biyani huner

Serejêr: 1-Weje 2-Stranên ku li ser zarokan tene xwendin/ Qeside, sirûd 3-Bi Erebi avahi/ Li Rojhilatê Ewropa navê gelekî 4-Kevireki giranbûha, safir / Ê dinale 5-Qertafa pîrehejmariya herdu zayendan/ Rewa, munasip 6-Udi, yê ku bi çekirin û lêdana ûdê re têkildar dibe/ Pêxemberê filehan 7-Di dinê Zerdûstiyê de, cihê ku dê roja qiyametê insan lê biçivin/ Sembola İridiümê 8-Di pîrehejmariya kişandina lêkera bûnê de, ravameya pêşker/ Cewhen, regez, çist 9-Navê nijadekê 10-Cephe 11-Desthilat, iktidar 12-Navê swarinek ku jî dan, nok û hwd. çêdibe, di nav salê de rojên çekirina ve swarinê hene

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12



BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ

Çeperast: 1-Zerdûst/ Amip 2-Elbane/ Eşiri 3-Ni/ Nikotin 4-Mecal/ Tapo 5-Avezelal/ Kêz 6-Vijaf/ Ne 7-Eyan 8-San/ Awaz 9-Tn/ İradi 10-Aş/ Nin Serejêr: 1-Zendavesta 2-Eli/ Viyan 3-Rb/ Mejan 4-Danezan/ İş 5-UNİCEF/ Ar 6-Şekal/ Awan 7-Olan/ Adi 8-Et/ Lerzin 9-Aşit 10-Minak 11-İr/ Pê 12-Pîroz

QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiyyê razînin:

Li derve: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Cağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Li Tirkiyyê: 385393

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopiyêke pelê razandina bedelê abonetiyyê bişînin.

Navnîşana Welat: Başmusahip Sok. Talas Han 16

Kat:3 No:301 Cağaloğlu /İstanbul

Tel (fax): 512 12 87

Mercên abonetiyyê:

	Li hundir	Li derve
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

Celadet, Elî Bedirxan rewşenbîrekî Kurd ê pirr hêja bû. Ji malbata Bedirxan Beg bû û di sala 1887'an de, li Stenbolê hate dinê. Celadet Bedirxan ne tenê rewşenbîr; zimanzan û mirovekî politik bû jî. Zimanê Kurd bi saya wî bû xwedî alfabeyê û gramera hemdem.

Malbata Celadet Elî Bedirxan di Kurdistanê de, bi nav û deng bû. Navê vê malbatê ji Bedirxan Begê Cizîrê tê. Bedirxan Beg, di navbera salên 1843-46'an de, ji bo damezirandina Kurdistananeke serbixwe, li hember îdareya Osmanîyan serî hilda. Serhildana ku bi serokatiya Bedirxan Beg dest pê kir û gelek bajarên Kurdistanê ji bin hîmaya Osmanîyan xelas kir, dîsa bi destê xwarziyê wî, Yezdan Şêr hate sekinandin û ev tevger têk çû. Li ser vê têkçûnê Bedirxan Beg bi malbata xwe ve hate sirgûnkirin. Cihê sirgûna wan **Girî** bû. Piştî demeke din ji aliyê **Abdulhamîd** ve ev cezayê sirgûnê hate hildan û malbata Bedirxan Beg li Stenbolê cihwar bû. Wê demê, Celadet Elî Bedirxan li Stenbolê ji diya xwe re bû. Celadet neviyê Bedirxan Beg e. Navê bavê wî Emîn Elî Bedirxan e, Emîn Elî Bedirxan şexsiyetekî Kurd ê pirr hêja bû û di nav **Cemiyeta Tealî Kurdistan** de, terefdarê serxwebûna Kurdistanê bû. Du birayên Celadet Elî Bedirxan hebûn: **Sureya û Kamiran**.

Celadet ne tenê di nav rewşenbîrên Kurd de, di nav yên Osmanî de jî rewşenbîrekî bijarte bû. Îhtîsasa Hiqûqê kiribû û zimanzanekî bêhempa (eşşîz) bû; ji xeynî Kurmancî, bi Tirkî, Îngîlîzî, Fransewî, Almanî, Farisî, Erebi û Yewnanî jî zanibû.

Celadet ji biçûkahiya xwe ve bi siyasê ve eleqedar bû. Şexsiyeta wî ya siyasî di nav tevgera **İttihat Terakkî** de çêbû. Ji ber dîtinên xwe yên siyasî û aliyên xwe yên Kurdîtiyê, piştî **Mutareka**

Em bi hev re hîn bibin

Celadet Bedirxan û Hawar



Logoya kovara Hawar

Lozanê, ji Celadet bavê, wî û herdu birayên wî, Sureyya û Kamiran re cezayê îdamê hate xwestin. Li ser vê yekê, Celadet û bavê xwe çûn Almaniyayê, Sureya û Kamiran jî çûn Misirê.

Celadet, bi mebesta lidarxistina xebatên siyasî, di sala 1930'an de, li paytextê Sûriyê, li Şamê cihwar bû. Di lihevkomkirina rewşenbîrên Kurd de, rolekî girîng list û di wê demê de cemiyeta Kurd **Xoybûn** ava bû. Celadet yek ji avakerên vê cemiyetê bû. Celadet heta dawiya jiyana xwe xebatên xwe yên li ser çand û zimên do-

mandiye. Di xortaniya xwe de, dema li Stenbolê bû, bi Xelîl Xeyalî re li ser zimanê Kurdî xebitiye û hewl dane ku Kurdî bi alfabeya Latîni bê nivîsandin.

Alfabeya Kurdî ya Latîni cara pêşî di **1932'an de ji aliyê Celadet Bedirxan** ve hatiye weşandin (neşirkirin)

Celadet Bedirxan, li Şamê roja 15'ê Gulana 1932'an kovara **Hawar** derxist. Hawar, heta hejmarê xwe ya 24. bi herfên Latîni û Erebi hate derxistin. Ji hejmarê 25. û pê ve tê de tenê alfabeya Latîni hate bikaranîn. Hawar piştî hejmarê

xwe ya 26'an ji ber pestên siyasî hefta sala 1941'an derneket. Hawar hefta 15'ê Tebaxa 1947'an jiyana xwe dewam kir û tev 57 hejmar derket.

Ji xeynî kovara Hawar, Celadet Bedirxan rojnameyek jî bi Kurdî derxist. Ev rojname **Ronahî** bû. Hejmara Ronahî ya yekemîn di **1'ê Nîsana 1942'an** de, hate weşandin û sala 1945'an 28 hejmarên wê hatin weşandin.

Kovara Hawar û rojnameya Ronahî, di pêşvebirina çand û zimanê Kurdî de, du weşanên pirr girîng bûn. Di van

weşanan de berhem û nivîsên gelek rewşenbîr û nivîskarên Kurd hatine weşandin. Wê demê şexsiyeten wek **Osman Sebrî, Kadrican, Nuredin Zaza, Kamiran Bedirxan, Cegerxwîn û Goran** di Hawar û Ronahî de nivîsandine.

Ji xeynî Hawar û Ronahî ev berhemên Celadet Beg hene: Alfabeya Zimanê Kurdî, Rêzimana Zimanê Kurdî, Ferhenga Kurdî, Riya Hînbûna Alfabeya Kurdî, Ji alfabeyê Çend Rûpel, Pêşgotin ji bo Mewlûda Kurdî, Pêşgotin ji bo pirtûka Îbadetên Êzîdiyan, Name ji Mustafa Kemal re, Pirsgrêka Kurdistan, Naveroka Bêdengiya Edirne.

BERSIV BIDIN VAN PIRSÊN LI JÊR

1. Celadet Elî Bedirxan li ku derê û kengê hatiye dinê?
2. Celadet Elî Bedirxan ji kîjan malbatê ye?
3. Bedirxan Beg begê kîjan êlê bû?
4. Serhildana Bedirxan Beg, kengê têk çû?
5. Yezdan Şêr kî bû?
6. Malbata Bedirxan Beg, pêşî sirgûnê ku derê bûn?
7. Navê Bavê Celadet Elî Bedirxan çi ye?
8. Piştî kîjan Mutarekeyê, Celadet Elî Bedirxan bi bav û birayên xwe re çûn derve?
9. Celadet Elî Bedirxan li Stenbolê bi kê re li ser Alfabeya Kurdî ya Latîni xebitiye?
10. Hejmara yekemîn a kovara Hawarê kengê derket?
11. Hawar tev çend hejmar hate weşandin?
12. Heta hejmarê 24'an Hawar bi kîjan alfabeyê derket?
13. Celadet Elî Bedirxan kengê rojnameya Ronahî derxist?
14. Rojnameya Ronahî heta hejmarê çendan, jiyana xwe domand?
15. Kîjan nivîskarên Kurd di Hawar û Ronahî de dinivîsandin?
16. Navê çend berhemên Celadet Elî Bedirxan binivîsin.



Kamiran Elî Bedirxan



Celadet Elî Bedirxan



Serokê PKK ê Abdullah Öcalan berî bi demekê Osman Sebrî li mala wî ziyaret kiribû.



EZ OSMAN SEBRÎ

Apê Osman, ji bo xwendevanên rojnameya Welat, tu ji kerema xwe re hinek dikarî ji kurtejiya xwe behs biki?

— Çiroka jina min gelek dirêj e. Ez Osman Sebrî me. Di sala 1905'an de, li gundê Naricê hatime dinyayê û ez yek ji endamên Êla Mirdêsa me. Di wê demê de mamosteyek bi navê İsmail E-fendi hate gundê me. Ew Kurd bû û hat ramanên xwe xiste serê min, ku çawa beg û axa zor û zilmê li gundiyan dikirin, ked û cifa karker, cotkar û belengezan dixwarin. Sev û roj xema wan ew bû ku, çawa gundiyan bixapînin. Ji wê rojê ve min berî ji beyan guhart û min sevê wan kir. Min kar û kiryarên wan yên xong (xerab) ji millet re xuya kir û min ew hetikandin. Piştî şikestina Şoreşa Şêx Seîd, ez hatim girtin û hikim dane min. Lê ji ber temenê min ê biçûk, nikaribûn min bi dar xînin. Lê li şûna wê 7 sal hikim dane min. Di wê demê de, kolonêlek Kurd ji Dêrsimê hebû, navê wî Husên Hisnî bû. Ji min re got: "Eger tu li vir bimîni wê te bikujin, lê ezê te xelas bikim." Di dema reva me de min zabiteki Tirk kust û di sala 1929'an de ez hatim Sûriyê. Li Sûriyê Fransîz ez gelek eşandim û ji min re gotin: "Tu, tu tiştê xerab meke, emê her mehekê 150 zêrê zer bi te din". Lê min qebûl nekir. Di wê demê de ez û zariyên Bedirxan, me partiyeke çêkir. Lê hikûmeta Fransa bi me hesê û li şopa me ket. Ji ber wê ji Celadet dixwest bireviya Bexdayê û Kamiran biçe Beyrûdê. Lê Fransîz nehiştin û ez girtim û sandime Filistinê.

Piştî sal û nîvekê, fermana ve-

gera min li Sûriye derket, ez ji Filistinê çûme Lubnanê. Li wir salekê ez mam, piştî wê ez hatim Şamê. Li Kurdistanê di beşê bin destê Sûrî de, ez û çend hevalan me Partiya Demokrat a Kurdî saz kir. Bi sedema xiyaneta hin kesan, em hatin girtin. Di hundirê mehkemeyê de Nûredîn Zaza ji qadî (dadger) re got: "Em ne rêxistineke siyasî ya ne, lê em rêxistineke ji bo mafên Kurdan ê civakî û çandî ne." Lê min ev gotin bi tevahî qebûl nekir û min got: "Em rêxistineke siyasî ne û em xebatê dikin ji bo bidestxistina mafê siyasî." Ez demekî dirêj di Hepsa Mezê ya bi nav û deng de, mam.

Apo, eger tu rê bidî min, ezê hinekî li ber dergêhen jiyana te ya taybetî rawestim. Tu dikarî hinek li ser Diya Hoşeng bixafî?

— Diya Hoşeng keça zabiteki Çerkez bû. ew di ordiya Tirkan de xizmet dikir. Ew, ji min gelek hez dikir û keça xwe da min. Di sala 1949'an de, jina min û wê bi hev ve hate girêdan. Ez gelek bi wê re dixweş û bextewar bûm, gelek bi kêrî min hat û zarokên me ji çebûn. Min navên Kurdan û perwerê Kurd li wan kir. Min erf û adet û ûsulên Kurdan ên kevin fêrî wan dikir. Ew ji destê hikûmetê re viyan. Çûne Ewropa. Wê 46 salan bi min re derbas kir, wê reş û spî dît. Şîrîn û tal tam kir, ji ber ku ez derve zarokan bi şan û enî bilind xwedî dikir. Cihê wê bihuşt be.

Zarokên te, niha li ku ne? Çi karî dikin?

— Kurê min ê mezin Hoşeng e. Niha li Almanya ye. Ew der-

manfiroş e û li ser doza welatê xwe dixebite.

Hoşin, niha li Swêdê ye, ew ji bi xwe andanzyarê mekanîkî ye.

Heval, wî ji xwendinê bi serî nekir û li welêt bê kar mabû. Niha li Amerika ye, ji xwe re kar dike.

Niha zarokên min, min xwedî dikin. Her wextê pereyan ji min re dişînin û ez pê rojên xwe yên mayî derbas dikim. Sê keçên min hene,

Di hundirê hepsê de min ji rewşên birên Kurd û Tirk re helbest dinivîsandin. Piştî ku ez hatim Sûriyê, Celadet Bedirxan Hawar derxist û li min bang kir ku ez bibim alîkar, di warê zimên de. Lê piştî demekê li ser hin babetan ez ketim hevrikiyê û bi sayê camêran em nêzikî hev bûn.

Hingûr û Hêvîn, ew li cem mêrên xwe ne û ya din ji Kewê ye. Ew ji Xwedê ji min re bihêle, berdestiya min dike.

Em werin ser jiyana çandî. Te çima rêça çandî ji xwe re pam kir? Cara pêşîn helbestên te di kîjan kovarê de der çûn?

— Xwendina min hindik e. Bavê min mir, apê min hat min ji dibistanê derxist ta ku min bi jin bikin. Kurd wê çaxê qîmeta xwendinê nedizaniyan weke îro. Min tenê şeş sal xwend. Lê belê ez jî bûm, di

zimanê Kurdî de gelek xurt bûm. Dîsa welê di zimanê Tirkî ya Osmanî de jî. Di hundirê hepsê de min ji rewşên birên Kurd û Tirk re helbest dinivîsandin. Piştî ku ez hatim Sûriyê, Celadet Bedirxan Hawar derxist û li min bang kir ku ez bibim alîkar, di warê zimên de. Lê piştî demekê li ser hin babetan ez ketim hevrikiyê û bi sayê camêran em nêzikî hev bûn. Em li hev hatin û bi hev re di Hawarê de em xebitîn. Piştî wê me Ronahî derxist, me gişan bi şev û roj, ji bo siyarbûna gel di rewşek pîr dijwar de, me kar dikir. Di Hawarê de, di wê demê de tu kes di warê zimên de, ji min xurttir tune bû. Yekemîn helbesta min di Hawarê de hat belavkirin û destpêka wê ji ev e:

Jin xweş e, bi xurtî di Kurdistan Kurd bav û biran, tev dijin bi derdan Min dil tu carî, nenaî û nedikali Dil xweş, min sînga xwe da ber ziman.

Hîkariya tu kesi li ser jina te ya çandî hebû?

— Na. Ez di warê zimên de gelek xurt bûm. Gava rehmetî Celadet bangî min kir û got: "Binivîsin. Nivîsandin, çi dikarî bike wê bike! Nivîsandin wê ji millet re bimîne." Ev gotin kete mejiyê min û ez bi zimên mijûl bûm. Ji pêşiyên me, di nav destê me de ji bilî Diwana Meleyê Cizirî û Mem û Zîn a Ehmedê Xanî û Feqiyê Teyran tu tiştî bêtir tune bû. Em di bin hîkariya ola îslamî de tîk çûn. Me bi zimanê Ereb û Tirkan xwend. Li Kurdistanê Ermenî û Suryanî hebûn. Wan bi zimanê xwe dixwendin,

bav û kalên me tu tiştî ji me re nehiştibûn. Ji ber wê jî îro em dibînin ku, pêmahiya çandê gelek jar e.

Rola te di derçûna mezintirîn kovarên Kurdî, Hawar, Ronahî de çi bû?

— Kurê min, Celadet xwe diyê herdu kovaran bû. Bes tenê karê min nivîsandin bû.

Gava rehmetî Celadet Bedirxan alfabe ya Latîni ji bo zimênê Kurdî amade kir, çi têbîn û pêşniyarên te li ser wî hebûn?

— Ew rûniştin baş tê bîra min. Wê çaxê Celadet ji me pirsî: "Gelo tu kêmanî di alfabe yê de heye yan tune ye?" Wê çaxê tu kes ji hevalên hazir deng bi wan neket. Min got: "Belê heye. Çar tîpên wê kêman in. Ew jî ev in: Ç, P, K, T." Celadet li min vegeft û got: "Binêr tîpên zimanên Ewropîyan, di navbera 29-31 tîpan de ne. Lê, tîpên me 33 tîp in." Min got: "Em ne Ewropî ne. Em ji xwe re ne. Dil dixwaze û hêja ye em ji weke Ewropîyan bi pêş kevin. Lê ne li ser hesabê zimanê me. Divê em mafê dengên zimanê Kurdî bidin û jê nestinin û tu zîyanê pê nekin." Dil dixwaze ku alfabe ya me nola alfabe ya rehmetî Qanatê Kurdo be.

Lê tîpên mîna H, X tu dibêji di zimên de hene yan tune ne?

— Belê kurê min, hene. Çimkî peyvên wan gelek in. Lê mixabin, em bi xwe tadayî li zimên dikin. Mînak:

H= Herî — Hêlik — Hêl

X= Xazî — Xulxula avê — Xulamti

Wê bidome Heupeyvin: Fener Rojbiyanî

welat

- Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres) Başmüshahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 • Tel (fax) 512 12 87
- Berpirsiyariya Ewropa • Postfâçh: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Berpirsiyariya Fransa: Amed Jemo • Rua G-401 92763 Antony Cedex France
- Çapkirin (Baskı) Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ